

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdêñ anatoliyê


bîrnebûn

hejmar 57 | 2013

HESENÊ METÊ

pêşîrên dayê

Hesenê Mete



Hesenê Mete 1957an de li qeza Diyarbekirê li Erganiyê hatiye dunê. Ji 1983 an vir ve li Stockholmê dimine.

Berhemên wî yên heta niha hatine belavkirin ev in;

Werger

1. **Keça kapitan** / Kaptenens dotter, av Aleksandr Pusjkin, bokförlaget WELAT, 1988
2. **Mirina karmend** / Tjänstemanens död, av Anton Tjechov, bokförlaget WELAT, 1989
3. **Merivén reben** / Arma människor, av Fjodor Dostoevski, bokförlaget WELAT, 1991
4. **Jiyana rastîn** / Det sanna livet, av Göran Tunström, Apec Tryck & Förlag, 2003,

Novel

1. **Ardû**, bokförlaget WELAT, 1990
2. **Smirnoff**, bokförlaget WELAT, 1991
3. **Labirenta cinan**, bokförlaget WELAT, 1994
4. **Epilog**, bokförlaget NÜDEM, 1998
5. **Tofan**, bokförlaget APEC, 2000
6. **Gername**, bokförlaget, APEC, 2005
7. **Gotinêñ gunehkar**, bokförlaget AVESTA, 2007

"Lê dayê ji zû ve miriye. Dema ku tev capûnekî sipî daxistin binê çalê û ji axa kolayî bêra pêşin havêtine ser sîngê dayê, têgêhîştim ku dayê di wir de ma û êdî ji wir dernakeve. Ez têgêhîştim ku min ci wenda kir. Hemû kesên li wir dikirin û dixwestin ku laşê dayê xweli bikin. Lê min nekir. Min tiştekî din kir. Bi dilekî tijî, bi gewriyeke tijî û bi çavên tije av ji wir bi dûr ketim û di wê gavê de min hîs kir ku ez bi aqil bûme, ez mezin bûme. Min êdî weke zarokan bawer nedikir ku dayê yeka nemir e, êdî min bawer nedikir ku mirin gelekî dûr e. Ez bûm yekî bi aqil, lê bêyî ku têbigêhîjim bê çima welê."

(ji kitêba PÊSÎRÊN DAYÊ)



11

Îsmaîl Beşikçî li Stockholmê



12

Şahcivana Kurdistanê



13

Meresîma bîranîna

Dr. Nebî Kesen

li Hamburgê

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 57 | 2013
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma redaksiyonê

A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit
Duran, Mem Xelikan, Mustafa Mih, Özgür Kara û Yusuf Polat

Adress

Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046–(0)8–761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet:

www.birnebun.com / www.birnebun.eu

Têkilî/Illişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045–27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:
Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049–172 298 24 51

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitâpevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Bîha/Fiyatı:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 5 TL



Xelkê me yê Rojava li ber xwe dide. Em bawer dikin û dizanin ê bi serkefin.

Wêneyê berg: Suleyman Danışman

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Îsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyen li derveyî Swêdê / Îsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro–Stockholm/Sweden
SWIFT: HANDSESS
IBAN: SE07 6000 0000 0002 6588 5078

Her niviskar berpirsê nivisa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîşen ji Bîrnebûnê re têñ, serrast û kurt bike. Ger nivîş çap nebin jî li xwedîyan nayêne vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştigirên kovarê ne.

Naverok

6	36
Jî Bîrnebûnê Alî Çiftçî	Çend nimûne ji klamên şînê Nûlî Ateş
7	42
Hilbijartina Herêma Kurdistana Başûr Bîrnebûn	Felek û tore Mem Xelikan
8	46
Şenayîyêni li Anatoliya Navîn Muzaffer Özgür	Şivan û şiv Nûh Ateş
10	47
İsmail Beşikçi li Stockholmê Alî Çiftçî	Kulîlka çiya Mam Recall
11	48
Şahcivana Kurdistanê Alî Çiftçî	Hatim ji bîrkirin Mam Recall
12	49
Meresîma bîranîna Dr. Nebî Kesen li Hamburgê Bîrnebûn	Dîroka rûreş û ez Xizan Şilan
23	51
Jî bo bîranîna Dr. Nebî Keseni Husêن Duzen	Ez Seyfi Doğan
30	52
Hilbijartina cihwariya adara 2014an Bîrnebûn	Jî kesekî hezkirî ra Lara-Sophie Milagro
31	54
Kongreya Netewî ya Kurd (KNK) Nuh Ateş	Sohbetên Mamê -1 Mam Recall
34	59
Bawerîyêni Ecêb Adem Özgür	Mînakên yekemîn çîrokên zarokan ên bi kurdî hatine nîvîsandîn û lêkolîna wan a ji aliyê naverok û şîweyîve Meral Solmaz

Ji bîrnebûnê

Ev deh sal in, kurd li Tirkiyê bi navê paketên wek "açılım, demokrasi" û hwd, bi lêvkirina hinek mafêن biçük têne xapandin. Bi vê paketa AKPê ya dawî ji ev baş eskere bû.

Mafê perwerdeya bi zimanê dê ku mafekê pir xwezayî ye, hê ji ev maf bo kurda mafekê rewa nayê dîtin. Ev maf, bi taybetî li Tirkiyê, ji dema osmanîyan vir ve, ji zarokêن kurdan re hatiye qede-xe kirin.

Piştî têkoşîneka dûrûdirêj hê ji tu statuyeka fermî li Tirkiyê nayê qebûl kirin. Dîsan bi gotinêن wek "Em birayê hev ên misilman in" dixwezin kurdan bixapînin.

Heta ku statuyeka fermî ya desturî di destura bingehîn a Tirkiyê de cih negirê, tu imkanêن ku kurd bikarbin zarokêن xwe bişînin dibistanêن taybet, ê nebin!...

Ev paketa Erdogan bo kurdan he-qaretiyeka mezin e! Çawa dibe zarokêن tirk bi hemû imkanêن dewletê herin bi zimanê xwe perwerde bibînin û pê serbilind bin û yên kurdan her li ser axa xwe bo zimanê xwe bi peran bixwînin. Ka ev çi biratî û ev çi edelet e!

Kurd êdî ne kurdêن berê ne ku bi gotinêن vala yên wek *em bira ne*, bêxapandin. Kurd li seranserê dînyayê belav bûne û bune xwedî têgihaştin û zanyariyan. Ev paketa Erdogan zatêن kurdêن ku dixwazin û imkanêن wan rê didin, bi karînin. Ji bo xwendina bi pera paketên wiha ji ne lazim in. Kur-

dan ev mafa ji zûve bi derxistine û bi kar ji tînin. Teknolojiya nû zûve ye ev sinor cirandiye.

Li tu derê dînyayê nehatiye dîtin ku dewletek bi destura xwe ya bingehîn hinek dengan qedexe bike. Ew tenê di dîroka dewleta tîrkan de heye û niha ji dibêن me herfêن Q, X û W serbest kiriye. Ev tenê dikare wek anekdotek bimîne di dîroka tîrkan de.

Heta ku kurd li Tirkiyê nebin xwedî mafêن xwe yên bingehîn û statuyeka fermî werneğrên, ne li Tirkiyê demokrasî bi cih dibe, ne ji, têkoşîna kurdan radiweste!

Siyaseta ku niha bi destê AKPê, bi serokatiya Recep Tayip Erdogan ve tê meşandin tenê ev e; dixwezin bi van paket û gotinêن vala hinek din ji xwe re wext qezenc bikin. Ji ber ku asîmilasyon li Tirkiyê pir bi hêz e. Ewqas bi hêz e ku tesîreka mezin li ser kurdêن derweyi welêt ji dike! Ji niha de li bajar, bajarok û gundêن kurdan hêdî piraniya zaro-kan bi kurdî nizanin. Ji ber wê ji mafê perwerdeya bi zimanê kurdî naxwezin qebûl bikin.

Kurd û siyaseta kurd divê hêdî dest ji menfaetên xwe yên şexsî berdin û ji bo mafê perwerdeya bi zimanê kurdî, bi şiyareka hewbeş a netewî têbikoşin û hemû imkanêن ku heta niha hatine bidestxistin, bi karbînin û ji bo mafê perwerdeya bi zimanê kurdî, li her derê seferber bin!

Ali Ciftci

Hilbijartinê herêma Kurdistana Başûr

21ê ilonê li herêma Kurdistana başûr hilbijartin çêbun

Komisyona bilind a hilbijartinê bi civîneka çapemeniyê rîjeya hilbijatinê Başûrê Kurdistanê eşkere kir. Li gor komisyonê ji sedî 73.9 xelk çûne ser sandiqên hilbijartinê û dengê xwe bi kar anîne.

Li bajaran rîjeya dengdanê wiha ye:

Li Hewlêrê ji sedî 71.7, Duhokê ji sedî 76.4 û li Silêmaniyê jî ji sedî 73 bû.


Ji 1991an vir ve bi rîvebirîya sûyasî ji aliyê PDK û YNK ve tê meşandin. Ji hilbijartina îsal de tişê ku rûda ev e:

Hêdî muhalefeteka bi xurt jî derketiye holê. Ev jî dide xuyakirin ku sistema bi rîvebirinê divê li gor dema nû û civatê ji nûve bêt guhartin.

Serokê komisyona bilind a hilbijartinê Serbest Amêdî li Hewlêrê di civîna çapemeniyê de encamên hilbijartina parlementoya Herêma Kurdistana Başûr eşkere kir.

Li gor vê encamê PDKê 743 hezar û 984 ray sitand û 38 parlementer derxist û bû yekemînê hilbijartinan. Bizutneweyê Goranê ku Noşîrvan Mistefa serokatiya wê dike 476 hezar û 736 ray sitand û 24 parlementer derxist. YNKyê jî 350 hezar û 500 ray girt û 18 parlementer derxist.

Yekgirtûya Îslamî 186 hezar û 741 deng girt û 10 parlementer, Komela Îslam 118 hezar û 574 ray sitand û 6 parlementer, her yek ji partiyên wek Bizutneweyî Îslamî, Demokratên Sosyalîst, Areste û Azadiyê parlementerek, kêmnetewyan jî ji ber kotayê 11 parlementer derxistin.



Şêneyîyen li Anatoliya Navîn

Amadekar: Muzaffer Özgür

Di havîna derbas bûyî da, li Anatoliya Navîn bi organîzasyona BDP, Partiya Aşitî û Demokrasiyê, li çend gundan şenayî hatin li darxistin. Hemû şenayî bi beşdariyên girseyî pêkhatin.

Şenayîya Xidir Îlyas

Duduyê hezîranê li gundê Şawlû-Haymaneyê di şenayîya Xidir Îlyasê de hatin ba hev. Şenayî ji aliyê BDP ve hat amadekirin. Hevserokê BDP Selahattin Demirtaş, parlementer Murat Bozlak û Erol Dora, berpirsiyarên navenda partiyê û yên bajarê Ankarayê jî beşdar bûn.

I. Festivala Çand û Hûnera Kurdan li Omera

Festival, li gundê Omeran di rojên 6-7ê tîrmehê da hat li darxistin. Festival, ji

aliyê reexistina BDP ya bajarê Konyayê va hat birêvabirin. Di festivalê de bi hezaran kurdên Anatoliya Navîn bi coşeka mezin cîh girtin.

Di Festivalê de hevserokê BDPê Gültan Kişanak, parlementer Murat Bozlak, berpirsiyarên BDP yên Ankara û Konyayê, serokê şaredariya Xelikan-Gölyaziyê Mulla Şimşek, berpirsiyarên Komela Mafê Mirovan yên şaxa Konyayê, meclîsa HDK ya Konyayê, Malbatên şêhîdan û bi hezaran hemwelatî amede bûn. Bi navê komîta amedekar Ayşe Özcan, serokê BDP yê



bajarê Konyayê Mehmet Bozdağ, bi navê malbatên şêhîdan Zeynep Yalçın, hevserokê BDP Gültan Kışanak û parlamentê BDP Murat Bozlak axaftina xwe kirin.

Kışanakê, di dengkirina xwe de di tekiliyên bi dewletê re agahdarî da û wiha got: “*Werin em piştgirijê bidin prosesa aşitîyê, di pêşeroja me de helbijartînên mehelî henê. Divê em destêن xwe bidin hev û di wê helbijartînê bi serkevin.*”

Bozlak jî di gotina xwe de bi kurtayı weng got: *Gelê kurd dest ji nasnameya xwe berneda, bernade jî. Li hemberî kurdan li ser dinê çi metot û sistem hene hemû bi kar anîn. 17 hezar cînayêteñ ku failen xwe nenas hatin kirin. Gundên kurdan hatin şevitandin û wala kirin. İnsanên me surgunî metrapolan kirin. Dem dema yekitiyê ye. Em yekitiya xwe ava bikin û azadiya me ne dûr e.*

Di bernameya çandî de jî Ferhat Tunç, Koma Agirê Jiyan, Ergin Xelikan û stranbejêñ navçeya kurdêñ Anatoliya navîn cîh girtin. Beşdaran bi coşeka mezin bi stranêñ xwe govend girtin.

Di festivalê de jinêñ kurd bi cil û bergêñ mehelî li meydana festivalê bûn. Nivîskarêñ li heremê dijîn û ji Amedê jî Komala Sarmaşık stand vekirin.

Festivala Xelikan – Gölyazı

Bi amedekirina şaredariyê festivala pêncemîn bi navê *Çand û piştgiriyê* li

Xelika di roja 7ê tîrmehê de hat li dar xistin.

Koma BDPê, piştî festîvala Omeran derbasî Xelikan bûn. Li wir jî peyamên siyâsî hatin dayîn.

Di bernameya çandî de jî; Ozan Ahmet, Ehsan, Ergin Xelikan, Zelal Gölçe û Ferhat Tunç stranêñ xwe gotin.

Yekemîn Şenayîya aşitî û biratiyê li Balayê

Di 25ê tebaxê da, şenayîya aşitî û biratiyê li gundê Kesikköprü (Bala) yê jî hat lidarxistin.

Di şenayîye de berpirsiyarêñ BDP yên Ankara, navçeyêñ heremê û parlamentê partyîê İdris Baluken beşdar bûn.

Di şenayîye de ji bo piştgiriya Rojava konê alikariyê hat vekirin.

Yekemîn festivala Sewêdiyan

Bi amedekirina şaxa BDP a Cihanbeyliyê, ji bo piştgiriya Rojava yekemîn festîvala sewêdiyan li gundê Çîmanê di roja yekê ilonê de hat li darxistin. Berpirsiyarêñ BDPê yên navendê, yên Konya û kurdêñ navçeyê beşdar bûn. Di festivalê de parlamentê BDPê Erol Dora di derheqa prosesa nû de agahdarî da. Ömer Faruk Hatipoğlu helbestêñ xwe, stranbejêñ heremê jî bi stranêñ xwe şenayî bidawî anin.

Îsmâîl Beşikçî li Stockholmê



Sosyologê navdar yê tirk Ismail Beşikçi, ku ji ber nivîsên xwe yên derheqê kurd û Kurdistanê de derdorê 17 salêni jiyana wî di zindanê Tirkîyê de derbas bûne, serdana Swêdê kir.

Ev cara pêşî ye ku Beşikçi hat Swêdê. Ev hatina wî ji aliyê Weqfa Çanda Kurdi li Stockholmê û bi hevkariya Weqfa Îsmail Beşikçî ya li Stenbolê ve hatiye organîzekirin. Armanca vexwendina Ismail Beşikçi ew bû ku Beşikçi dîmenekî dîyaspora kurd li Swêdê bibîne û herwiha li ser rewşa kurdan konferansekê bide.

28ê ilona, 2013an de li paytextê Swêdê, li Stockholmê Konferansa Mamoste Îsmail Beşikçî hebû. Bi qasî 400 kes besdarî konferansê bûn. Li derî salonê sîstema guhdarî û temâşekirinê ava kirin. Kurd, tirk, suryanî, ereb û swêdî wekî guhdar besdarî konferansê bûn. Mamoste Beşikçi bi tirkî deng kir û dengkirina wî Hediye Guzelê simulant (raste rast) wergerande zimanê swêdî.

Mamoste Îsmaîl Beşikçî ji dîrokê dest bi axaftina xwe kir. Siyaseta dema

Osmaniyan de û her wiha dîtinêni Îtihat-Terakî ku dê cawa Anatoliyayê ji pontos, ermenî, asurî-suryanî ya bêt pakij kirin û di wan qatliamana de çawa kurd xapandine û bikaranîne, bi çavkaniyan pêşkeşî konferansê kir.

Di dawiya konferansê de li ser hevkariya welatên Ewropa, Amerika û Tirkîyeyê sekinî û gotara xwe wiha bi dawî anî:

"Di parçekirina Kurdistanê de welatên Ewropa û Amerika berpirs in. Dîvê kurd wê pirsé herdem ji wan bikin. Gelo çawa dibe ji welatên endamên Yekitiya Netewan ku ji aliyê 27 welatan ve pêk té, ji wan heft welat niştecihên xwe ji yên kurdan zedetir an qasî yên kurdan in. Ên mayî ji niştecihên xwe ji yên kurdan kemtir in. Tu mafê kurdan tuncye ku xue di YN de temsil bikin. Ev bêheqiyeka mezin e. Ev ci demokrasî ye ku neteweyek bi hejmareka 40-50 hezar niştecihî bikaribe di bîryarêni derheqê 50 milyon kurdan de bibe xwedî maf û tu mafşen kurdan tunebe?!"

Şahcivana Kurdistanê

Êvara 28ê meha ûlonê li bajarê Hewlêrê, katjimêr 21.00 de bi beşdariya sosyeta kurd, civata hunermen-
dan û bi beşdariyeka mezin dest bi şenavîya pêşbirika hilbijartina şahcivana Kurdistanê bû.

Jurîya ku ji 10 endamên kurd û xerib ve pêk hatibû, ji 12 keçikên ciwan ew kesêni li jêr hatin hilbijartin.

Fenik Muhammed Abdulerîm (25) ji Silêmaniyê wek şahcivana Kurdistanê hat hilbijartin. Fenik Muhammed Abdulerîm piştî ku taca Şahciwaniyê da serê xwe, wiha got; *ji bo jinêñ kurd, li dinyayê bêñ naskirin ev xebatêñ wiha pir giring in.*



Dania Enver duyem û Çawan Muhammed jî sêyem hatin hilbijartin. Piştî hilbijartin xilas bû Şahcivana Kurdistanê bi otomobileke modela 2013an ve hat xelat kirin.

Beşdarêñ din jî bi xelatêñ curbecur hatin xelatkirin.



Meresîma bîranîna Dr. Nebî Kesen li Hamburgê

**NEBÎ DÊ DÎ DIL Û BÎRA ME DA
HERDEM BİJÎ!**

Yanzdeyê meha îlonê salvegera koç-kirinaheval û hevkarê me Dr. Nebî Kesen bû. Bi minesebeta ji nav me çûyîna wî ya bêdawî, kovara Bîrnebûnê û malbata Nebî, bi hev re, di 14ê îlonê da, li bajarê Hamburgê meresîma bibîranîna wî amede kirin.

Heyfa Nebî, bi krîza dil wî can da, dinya xwe ebedî gûherî, malbat, heval û hezkirên xwe di nav xem û kede-



ran da cihîst. Jiyanekî ku li navçeya Încowê (Cihanbeylî-Konya) 50 salî di ber vê destpêkiribû, bi dawî bûbû. Nebî li Încowê hate dinyayê û mezin bû. Li Încowê di telebetiya xwe da dest bi karê şoreşgeriyê kir. Bi gruba Riya Azadî re ji bo sosyalîzmê û aza-diya miletê kurd kete nav kar û xebata siyasi. Li piştî derbeya eskeriyê, ew jî




Foto: Bejna Kesen



Foto: Bejna Kesen

mîna bi hezaran kurdên din kete riya xerîbiyê û hate Almanyayê. Li wir jî ew di nav rêxistina KOMKARê da teve kar û xebata azadiya mîlete kurd û heq û azadiyên koçberan bû û bi salan ked da.

Wextek hat wî dest ji karê partîtî û rêxistinî berda lê kar û xebata wî danewestî. Wî di NAVANDA Kurd, Özgür Politika û Roj TV da kar û xebata siyasi, zanyarî û niviskarî dewam kir. Dem hat ew bû nivîskarê kovara Bîrnebûnê û dest bi nivîsandina kurdî kir. Nebî di xebat û danûstandinên xwe da neyartî nekir û dest ji çavkirîna dilûxatiran û tîfaqa kurdan berneda. Di karê xwendinê da jî zîrek û serkevtî bû û doktora aboriyê bi dest xwe xistibû.

Serdana gorna Nebî

Bernameya bibîranîna Nebî bi serdana gorna wî ya li Goristanê Hamburg-Altonayê destpêkir. Pişti dawestîna rêzgirtinê ya bêdeng endamê redaksiyona Bîrnebûnê, Mistefa Mih bi navî Bîrnebûnê, li ser gorna Nebî, li ber resmê wî û ala Kurdistanê, di nav heyamekî xembar, bi şîn û girî da ev kurtegotara pêşkêş kir:

Nebî can,

bi minesebeta salvegera koçkirina te ya bêdawi, hiro em hatina serdana te, li dora gorna te kombüne û te bibîr tînin.

Lawê te yî delal Serko, diya wî Anke û xanîma te Îrmî, bav û bra, mermalî û xismê te, heval, hevkar, dost û yarê te, em gişt bi hêş û hîzrên xiye li ba te ne.



Foto: Bejna Kesen

Vê gavê em hem şad û hem ji xemgîn in.
Şad in, ji ber ku em li ba te ne û xemgîn in,
ji ber ku tu bi bedena xwe ji me dûr i.

Beşdarêñ eziz,
sala çûyî bi van çaxana heval û hogirê
me, merivê durist, fedekar, akademisyên,
çalakvanê siyasi û xebatkarê doza azadî
û rizgariya Kurdistan, aligirê idealên so-
syalistî û niviskarê Bîrnebûnê, Dr. Nebi

Kesen di 11ê meha ilona xopan ya 2012an
da, ji nişkava, bêwext ji nav me bar kir û
bêdawî dinya xwe guheri.

Ew ê her dem bi kar û kirin û taybetiyêñ
xwe yên xas û birûmet di bîra me da bijî.

Nebiyo, cihê te şen û gurleh û rihê te şad
be!

Kombûna li hola HBE

Piştî serdana gorna Nebî endamên mal-
bata Nebî, heval, hevkar û hezkirên wî li
hola HBE - Hausbürgerschaftliches Enga-
gements kombûn. Li wê derê ji bername-
ya bibîranîna Nebî bi gotarêñ brayê Nebî,
heval û hevkarêñ wî dewam kir.

Bi navî Bîrnebûnê Eli Çiftçi gotarek
pêşkêş kir û tê da qala kesetiya Nebî, kar
û xebatêñ wî kir. Di gotara xwe da Eli
wer got: "... Hezar carî mixabin, mirin pir
geleş û sar e! Xeber nade û nebêje va ye ez



Foto: Bejna Kesen

têm, da ku em xatir ji hev bixwazin!.. Mirina di temenekî ciwan de herdem meriya pir diêşîne! Gelek nas, dost, merivê nêzî meriv; bav, dê, bira, xuuşk, ap, xal û xwarzyên meriv dimirin, giştik jî ji bo herkesi windayiyeka mezin in! Lé mirina hinek insanan ne tenê bo dost, nas û meriyên xwe, herwiha ji bo hemû gelê xwe wendayiyek e! Erê, Nebî Kesen jî yek ji wan kesan bû ku ji bo me giştika, windayiyeke pir mezin bû!

Ba me kurdan gotinek heye ku piraniya me bîhistine, dibên; "Mirî bi qimet dibin!"

Rast e, mirî bi qimet dibin û zú jî têñ jibîr kirin! Lé merivên wek Dr Nebî Kesen bi rasti, bi hewildan û berhemên xwe her li ber çavan in, ji bo wê jî dê Nebî zû bi zû neyê ji bîr kirin. Ew dê herdem, bi dîtin û kesatiya xwe ya baş û pak di hiş û biranînên me de biji û her li ber dilê me be!

Elî di gotara xwe da pêşniyar kir ku li Încovê bi navî Nebî, bi pêşêngiya malbata wî kitêbxaneyek bê avakirin û ew ê alikariyê bidin vê projeyê.

Di pêy Elî, brayê Nebî, Îse gotarek bi dengekî kelegirî û bi kurdîya xwe ya xwaş û cîwarî pêşkêş kir. Wî di gotara xwe da qala jiyana malbata xwe, taybetmendiyên Nebî, xebat û tekoşîna wî, zilma dema derbeya leşkeriyê ya li ser malbata wî kir. Bi dengkirina wî ra dengê şînê, yê îskeiske jin û mîran li holê belav dibû. Di gotara xwe da, Îsê wer pêda çû:

.... Em iro wek xwastina te, bi awayekî yekîti tevhevin û li hemberî te rawestine. Em baş dizanîn ku, te ji şîn û girî heznedikir. Û tu hertim bi serbilindî û camêr jiyayî. Têkilî û hevaltiya te, bi hemî parti û réxistinên kurdan re hebû û wekhev bû.



Foto: Bejna Kesen



Foto: Bejna Kesen

*Ji ber ku; hemi xebat û xwastinên te, ji bo
Kurdistanek azad bû...*

*Kek Nebî, di zarokatiya xwe da jî, ke-
sekî bi nav û deng bû. Wan salan, bavê min
li dervayî welêt kardikir. Nebî, mezinê me
giştikan bû û malbata me, wek bi navê wî
dihatibû nasîn. Ji bona wê, gelek hevalên
wî pir bûn. Û lewma ji mala me, mîvan
qet kêm nedibûn.*

Ji xwendinê pir hezdikir...

*Mala me, wek pirtûkxaneyek biçûk
bû. Û bi şev û roj pirtûk dihatin xwendin.
Dengê muzika Şivan Perwer, ji hundirê
malê me da herdem dihate bihîstîn.*

*Bi piranî dereng diha-
te malê. Dayîka me, Nebî
pir meraq dikir. Dema em
sibê bixwe dihêsiyan, me
didit ku; hema hema hemi
diwarên xaniyên gund,
hatîne nivîsandin. Helbet
me dizanî bû ew nivîsan ji
hêla kê û kîjan rôexistinê da
dihatibû nivîsandin.*

*Li Încovê, DHKD ji hêla kek Nebî û
hevalên wî da hatibû avakirin...*

Hevalê Nebî, nivîskar Husênu Duzen gotarek pêşkêş kir. Duzen, qala hevaltiya xwe û Nebî ya sî saliyî kir. Nimûneyê balkêş yên vê hevaltiyê, xebata Nebî ya siyasi û zanîstiyyê kir û kurtefilmekî (videyo) xwaş yê ku ew û Nebî jî tê da bûn, nîşanî mîvan û beşdaran kir.



Foto: Bejna Kesen

Heval û hevkarê Nebî, Şeref Xoce
bi navî KOMKARê gotarek peşkêş
kir. Wî qala hevaltiya xwe ya bi Nebî



va, kar û xebata Nebî ya bi rêxistina KOMKARê va ya bi salan kir. Şeref Xoce peyama navenda KOMKARê û ya PSK jî pêşkêş kir.

Hevalê Nebî, M. Ali Yıldırım jî biranînen xwe anîn ziman û behsa jiyanâ Nebî ya Hamburgê kir.

Nunerên YEK-KOM û rojnameya Özgür Politîkayê jî beşdarî meresim bibîranîna Nebî bûn. Nunerê YEK-KOMê, Nihat Baydilli gotareke qut peşkêş kir û tê da behsa hevkariya Nebî di salêن dawiyê da bi rexistina YEK-KOMê va kir.



Bi dirêjiya bernameya di holê da, bi PowerPointê ya ku endamê redaksiyonâ Bîrnebûnê, Muzaffer Özgür amede kiribû, jiyanâ Nebî ta jî zaroktiyê vir da bi fotograf, belge û nivîsaran hate nimandin.

Li dawiya bernameya bibîranîna Nebî, malbata wî xwarin û vexwarin dan ber mîvan û beşdarên meresimê.

Bîrnebûn



Foto: Bejna Kesen

Axaftina Ali Ciftci

Ji bo meresîma bibîranîna Dr. Nebî Kesen, Hambûrg-Almanya, 14ê ilone 2013

Beşdarêni bi rûmet,
Şerkoyê delal,
hemû endamên malbatê,
heval û dostêni Nebî,
hûn hemû bi xêt hatine û we bi rîhê
rehmetî, Nebî silav dikim!

Em îro ji bo bibîranîna rehmetî, Dr. Nebî Kesen civine! Ev roj ji bo me giştîkan hem rojeka xemgînîyê ye û hem jî rojeka dilşayîyê ye. Rojeka xemgînîyê ye ji ber ku me insanekî nêzî xwe; hevkar, dost û hezkiriye kî xwe yî hêja wenda kiriye. Rehmetî Dr Nebî bi fizîkî êdî ne li nav me ye!

Em dilşa ne, ji ber ev insanê, dilpak, şoreşger, demokrat, humanist, welatperwer, jêhatî, bi bîrûbawerî, xwediyyê berhem û xebatêن hêja, em di rojeka weng da anîn ba hev û ev roj, em bi bîranînê xwe, wî bibîrtîtin û xemgîniya xwe bi hev re parve dikan.

Nebî 1962an de li Încovê xwedê da û mezin bû. Li Încovê çû mektebê û lisê li wir teva kir.

Nebî hê di temenekê pir ciwan de, dema diçû xwendina navendî

(orta okulê) di nav grubêñ telebeyêñ kurdan de aktîv bû. Salêñ 1975-79.

Tê bîra min ew û rehmetî Yilmaz Demîr û çend xortêñ din, her bi hev re digerîn, li kuderê kombûneka telebêñ kurdan li Cihanbeyliyê dibû her li wir dihatin dîtin. Wê demê li Konya, Cihanbeyliyê sempatizan-ên Riya Azadî, DDKD û Rîzgarî hebûn. Piranî li derûdora DDKDê û Riya Azadîyê kom dibûn. Kovarêñ wek *Özgürlik Yolu* û *Rizgarî* ku derdiketin, ji hêla telebêñ kurd ve dihatin belav kirin û xwendin. Ev herdu rehmetî jî, neku hevalbendêñ hêzêñ ku ev kovar derdixistî bûn, ev kovar belavdikirin. Na, ji ber navêñ wan bi kurdî û yên kurdan bûn.

Ez bi xwe di bihara 1977an de ji ber pevçûnêñ siyasî yên wê demê, demekê di hepixxana Cihanbeyliyê de mam. Ev herdu rehmetî jî her hefte dihatin serlêdana min. Qet jibîr nakim! Ji herkesî pirtir wan pirsa min dikirin.

Piştî derbeya eskeriyê, 1980î ew jî mîna bi hezaran kurdêñ din derket derveyî welêt û hat Almanyayê bi cih bû. Li wir jî, li rû xwendin û karê xwe yê rojane, bi KOMKARê ra teve kar û xebata sewa azadîya mîlete kurd, heq û azadîyêñ koçberan bi salan xebitî. Piştire di *Nawen-*

da Kurdi, Özgür Politika, Roj TV û Rûdawê da kar û xebata siyasi û niviskarî dewam kir.

Di xebat û danûstandinên xwe da neyartî nekir û dest ji dilûxatiran û tîfaqa kurdan berneda.

Di karê xwendinê da jî jêhatî û serkeftî bû. Doktora aboriyê bi dest xist. Ev xebata xwe hem bi zimanê tirkî û hem jî bi almanî wek kitêb hate çap kirin. Di kovar û rojnamên kurdî de bi kurdî jî nivîsên li ser

Yêkiya Europayê - Tirkîye û kurd dinivisand.

Dr. Nebî Kesen di van salêن dawî de, bi awayekî çalak (aktîv) di kovara Bîrbûnê de kar dikir. Ne tenê bi nivîs û dîtinên xwe her di pratîkê de jî qasî jê dihat dixebeitî. Di civîn û konferansên li ser diyaspora û nas-nama kurd de, çalak bû

Di du konferansên li ser Kurdên Anatoliyayê, ya li Kopenhag û Încovê de xebateka heja kir. Keda wî di orgenize kirin û birêvebirina her du konferansa de pir bû.

Rojane nebe jî heftane her bi rîya telefon û e-nama bi me ra têkiliyî de bû!

Hezar carî mixabin, mirin pir qe-leş û sar e! Xeber nade û nebêje; va ye ez têm, da ku em xatir jî hev bix-

wazin!.. Mirina di temenekî ciwan de herdem meriya pir diêşîne! Ge-lek nas, dost, merivê nêzî meriv; bav, dê, bira, xwuş, ap, xal û xwarziyên meriv dimitrin, giştik jî ji bo herkesî windayiyeka mezin in! Lê mirina hinek însanan ne tenê bo dost, nas û meriyên xwe, herwiha ji bo hemû gelê xwe wendayiyek e! Erê, Nebî Kesen jî yek ji wan kesan bû ku ji bo me giştika, windayiyeke pir me-zin bû!

Ba me kurdan gotinek heye ku piraniya me bihîstîne, dibêñ; "Miri bi qimet dibin?"

Rast e, mirî bi qimet dibin û zû jî têñ jibîr kirin! Lê merivên wek Dr. Nebî Kesen bi rastî, bi hewildan û berhemên xwe her li ber çavan in, ji bo wê jî dê Nebî zû bi zû neyê jî bîr kirin. Ew dê herdem, bi dîtin û kesatiya xwe ya baş û pak di hiş û bîranînên me de bijî û her li ber dilê me be!

Roja 8/12-2012an de ji bo bi bîranîna rehmetî Dr. Nebî Kesen, çend heval, nasûdostên Nebî, endamên redaksiyona weşanxanê, ji endamên Waqifa Kurdên Anatoliyê, li Stockholmê, li lokala Apecê civiyan. Di vê kombûnê de gotinên du kesên ji Încovê dixwazim bi we re parve bikim:

Xizan Şilan: Min berê rehmetî Nebî Kesen nas nedikir. Sê an çar caran hatibû bajarê Stockholmê. Min ew bi saya kek Eli Çiftçi nas kir. Lê berî ku em hevdu nasbikin, min ew gelek caran di Roj-tv de dîtibû. Dema ku ew di bernameyan de li ser rewşa kurdan û dîroka Kurdistanê diaxivî, ez pê kêfxweş û serbilind dibûm ku merivekî wisa zana û têgêhiştî ji nav kurdên Anatoliyê derketiye... dil, li min şad dibû.

Belê, min ji nêz ve Nebî nas kir. Nebî berî her tiştî xwediyyê exlakekî durist, xweşbînî, paqij, dilpak, dilsoz, stûnerm û xwediyyê bîr û baweriyê û demokrat bû.

Osman Köse: Ez û rehmetî Nebî Kesen, li Încovê hevalê hevdu bûn. Têkiliya me bi hevdu re pir baş bû. Wê demê em xort bûn. Ji me re rojnameya *Riya Azadî* û kovara *Rizgarî* dihat. Nebî wê demê xortên Încovê li dor xwe kom dikirin û ji me re nivîsên rojnameyê dixwendin û li ser mijaran, ê têketa nav giftûgoyan. Nebî gelek zîrek, jêhatî û kurdekkî welatparêz bû. Xwediyyê şexsiyetekî durist bû. Mirina wî ez pir êşandim. Belê herkes ê rojekê bemire, lê hevalê me Nebî pir ecele kir. Ew ê her tim di dilê me de bijî."

Ji nivîsa Nebî ya dawî:

"*Di diyaspora kurdan a li Europa hejmara kurdên Anatoliyê gelek mezin e. Li hinek dewletan wek Danîmark û Swêdê, piraniya kurdan ji Anatoliyê koçkirine û li vir cî girtine. Lê, heta niha hindik tişt batin nivisîn. Divê di dema pêş de ev mijar jî bi berfirehî bê ziman û nivîsandin. Çîma ku diyaspora kurdan, tesîr û rola wê êdî wek rastîyek û beşek civata kurd ya dinê tê qebûl kirin.*

... Çalakî û pirozbahîyên li diyaspora bo parastin û pêşvebirina nasnameya kurd giring in. Medya kurd weke televîzyon, ji aliyê ziman û çandê ve êdî roleke navendî girtiye. Di dema globalizma iro de, nasname û çand bi derfetên telekomûnikasyon li der sinorêñ dewletên netewî de cih digrin û xurt dibin (cihê civakî ya transnasional). Kurd ji bo vê pêvajoyê nimûneke baş in. Tê xuyakirin ku kurdên li welaat û li hemû diyasporayan (Anatoliyê, Kafkasya, Tirkîyê, Europa hwd.) xwe di bin nasnameyek tenê de ifade dikin. Ew jî, nasnameya netewî ya kurd e.

"

Li ser şeva Încovê li Danîmerqê ".... Pir balkêş bû ku kesekî wek Atilla Kart hat Kopenhagê û di şeva Încovêyan de sîyaseta dewletê û CHPê ya înkarkirina nasnameya kurd

anî ziman. Li Elmanya jî, carcaran parlamentên CHPê wekî Kamer Genç besdari şevê Dersimîyan dibin û li hember ``hemwelatiyên`` xwe behsa Ataturk û Tirkîyê dikan. Eger ev kes ne parlementer bin, nikarin di şevê dîyaspora ya kurdan de van şashti û derewan ewqas eşkere bêjin. Ji ber vê yekê, statûya mebûsi û serokatîya şehredariyi (beledîyan) piri caran li hember kurdên dîyasporayê dibe avantajek.

Di salêن dawî de du pêvajoyên nú di nav kurden dîyaspora de derketin holê. Di bin navên gund û bajaran de şevê çandî û muzîk têن çekirin. Mêvanêن van çalakiyan piri caran jî Tirkîyê û Kurdistanê ne û ew di axaftinêن xwe de ji aliyekê hîsên hemşerîtêyê pêş dixin, ji aliye din jî sîyaseta partiyêن xwe yêن wek AKP û CHP dikan. Mixabin, pir caran ne partiyêن kurd ne jî rêxistinêن dîyaspora kurd têن dawet kirin. Diuê ev

kêmasî ji holê rabe. Bona vê jî, mijara diyaspora bi firehî bê lêkolîn û niqaşki-rin. Kurdên Anatoliyê grûbeke balkêş a diyaspora kurd e ú di Bîrnebûnê de ji aliyêن civakî, aborî, çandî û sîyasi ve lêkolîn bêñ kirin".

Nebî, herdem kurdistanî difikirî û ji bo nasname û mafê gelê xwe her roj di fikir û xebatan de aktiv bû. Me wek kovara Bîrnebûnê nivîskar, heykar û dostekî qedirbilind û gelê kurd jî ewladekî xwe yî hêja û dilsoz wenda kir!

Dr. Nebî Kesen, ji ber xwedîyê bîrûbaweriye ka xurt, berhemdar, rastgo, demokrat û welatperwer bû, divê em navê wî bidin jîyandin. Ji bo vê jî ez li vir pêşniyaz dikim; em li Încovê bi Navê Dr Nebî Kesen kitêpxaneyekê vekin.

“Kitêpxaneyâ Dr Nebî Kesen” ku ji herkesi re vekiribe û bibe ciyekî xwendin, lêkolîn û kombûnê.

Axaftina Îsa Kesen

Bavê Serko

Mamê Mustafa Can, Rojda û Besnayê, Xalê Sercan û Ciwanê
Û birayê Muse, Îsa û Zubeydeyê,
Birayê min Nebî û havalên wî yên
hêja,
em îro wek xwastina te, bi awayekî
yekitî tevhevin û li hemberî te
rawestîne. Em baş dizanin ku, te
ji şîn û girî heznedikir. Û tu her-
tim bi serbilindî û camêr jîyayî.
Têkilî û hevaltiya te, bi hemî partî û
rêxistinêne kurdan re hebû û wekhev
bû. Ji ber ku; hemî xebat û xwastinêne
te, ji bo Kurdistanek azad bû...

Kek Nebî, di zarokatiya xwe da
jî, kesekî bi nav û deng bû. Wan sa-
lan, bavê min li dervayı welêt kardî-
kir. Nebî, mezinê me giştikan bû û
malbata me, wek bi navê wî dihatibû
nasîn. Ji bona wê, gelek hevalên wî
pir bûn. Û lewma ji mala me, mîvan
qet kêm nedibûn.

Ji xwendinê pir hezdikir...

Mala me, wek pirtûkxaneyek
biçûk bû. Û bi şev û roj pirtûk di-
hatin xwendin. Dengê muzîka Şivan
Perwer, ji hundirê malê me da her-
dem dihatebihîstin.

Bi piranî dereng dihate malê.
Dayika me, Nebî pir meraq dikir.
Dema em sibê bixwe dihêsiyan, me
didît ku; hema hema hemî dîwarêne
xanîyêne gund, hatîne nivîsandin.

Helbet me dizanî bû ew nivîsan ji
hêla kê û kijan rêxistinê da dihatibûn
nivîsandin.

Li Încovê, DHKD ji hêla kek
Nebî û hevalên wî da hatibû avakirin.

Sala 1980, 11 Îlonê, roja wî ya
xatir xwastinê bû. Wê rojê, kek Nebî
çûbû Almanyayê. Dayik û mamê
min di nav rewşek dijwar da hiştî
bû. Ji ber ku veşartina pirtûk, kasêt
û nivîsene wî, bûyî bû zehmetekî pir
mezin. Paşê, ji ber tirsa dewletê me
hemû pirtûk û kasetêne wî şewitandin.

Piştî heyşt salan, ez jî çûbûm
Almanyayê û me li Hamburgê
hevdû dîtibû. Kek Nebî, wê demê li
bajarê Kolnê dixwend. Di jîyana wî
da, wek du tiştên giring hebûn. Ya
yekemin; doza Kurdistanê, ya duye-
min jî; xwendin û nivîsandin bû...

Ew ne tenê birayê min, ew birayê
hemi Kurdan bû jî. Min rojekê jê
pirsî: 'Kekê Nebî, Xwedê neke, rojekê
tiştekî xirab were sere te, em kijan
rêxistin an jî partîya kurdan agah-
dar bikin?' Wiha bersiv dayîbû min:
"Kijan kurd ji bo min ci difikire bila
bifikire. Ez piştbazê hemî kurda me."

Birayê delal û hevalên wî yên
hêja, em bi hebûn û jîyana kek Nebî,
herdem serbilind û bextewar in.

Gelek sipas ji bo hatina we û ji
bo avakirina vê bîranîna bi rûmet û
watedar!

Û hûn her bijîn!

Jİ BO BİRANÎNA Dr. NEBÎ KESEN

Husêن Duzen,

Gelî hezkiriyên Nebî, hûn bi xêr hatine.

Ankeya delal,
Serkoyê delal,
ezê niha bahsa hin bîranînê xwe yên bi Nebî re bikim. Ez dizanîm hûn bi kurdî nizanin. Min bibexîşînin ku ezê bi zimanê ku ez bi Nebî re diaxivîm, niha jî rasterast bi wî re biaxivîm:

Nebî,
di ser çûna te re va salek derbas bû. Gelek hezkiriyên te li hev kom bûne û te di bîranînê xwe de zindî dikin. Berî bi kîliyekê Eli Çiftçi, piştî wî jî birayê te Îsa axivî; herdu jî bi kurdiyekê li gor dilê te. Di kîliya ez van peyvan ji te re dibêjîm, çavên min bi yên Nûh Ateş dikevin. Bi hemû aramî û baldariya xwe li peyvîn li ser te têngotin guhdarî dike. Ew şeva ku berî çûna te bi çend heftiyan ez, tu û Nûh li Hamburgê derbas kir, tê bîra te? Ew ci şeveke ji dilî tije şadî û henek bû Nebî! Ger te ecele nekira û wisa bêwext ji nav me neçuya, me dê hîn gelek şevêni bi sohbetê germ, mîna wê şevê bi hev re derbas bikirna.

Qey te û pelên darêن Hamburgê li hev kiribû? Wan jî par vî çaxî

bêwext dest bi weşanê kiribûn. Te jî her wisa kir keko! Hîn cotmeh nehatibû, pêşangeha pirtûkan li Frankfurtê dest pê nekiribû, pelên darêن Hamburgê kolan bi rengên têkel xemilandibûn jî. Çavêن me hîn li hêviya weşana pirtûka te ya nû bûn, te ew li cih hişt û berî bi salekê te bi weşana pelên darêن Hamburgê ya bêwext re paşê xwe da me. Çûyineka ewqas zû! Niha ez li pelên hêşin ê daran mîze dikim û tu wateyê nadim wê çûna te ya bêwext, Nebî!

Her ku nivîseke min derdiket te xwe bi réya telefonê yan a hevdûdîtinê digihand min, te hîzrên xwe li ser digotin. Di vê sala derbasbûyi de gelek caran çavên min li te geriyan. Heta niha jî mejiyê min tunebûna te napejirîne, loma nîvisandina van çend rîzêner rasterast ji te re jî ma heta îro.

Di 30 salêن hevaltiya me de, qederê tê bîra min, ji bo çend mehekî tenê em ji hev dûr ketibûn. Jê pê ve li gel ku em herdu jî çend salekî ne li Hamburgê bûn jî me derfetek didît, ji bo ku demeke kurt be jî, em hev bibînin. Lê vê carê te tu derfet ji bo hevdudînê nehiştin û tu çû Nebî! Gelo tu dizanî bê te ci li dûv xwe hişt?

Par, piştî min nûçeya reşbihist, ez li nemreya telefona te ya destan geriyam. Kesek nehat ser. Ev cara pêşin bû kesek nedihat ser û piştî çend xulekan jî tu deng jê nedihat. Ez li Îshan Akbaş geriyam, ew jî şâşwaz ma. Hîn ez û ew li ser telefonê bûn, Şêxmus Özzengin li min geriya û got ku nûçe rast e. Li ser rêya Camiya Şêx Seîd kevaniya te Irmgard jî telefonî min kir û bi kurtahî bahsa çûna te kir. Nûçeya xerab zû belav dibe. Ez di U-Bahnê de bûm Şukru Bulut ji Katalonyayê telefon kir; ew jî hîn bi dû hêviya ku nûçe derew be de bû. Telefonâ Şukru xemgîniya wî bêtir kir. Li stasyona tirênen Îshan li hêviya min bû. Em çûn camiya Şêx Seîd.

Kêliya em gihîstîn pêşberî camiyê komek zilam li wir dipan. Ruyên wan têkel bûn. Yek dudu ji wan nikarîbûn bi herka rondikên xwe, lema berê xwe ji civatê diguhertin ji bo hinek xemgîniya di nava xwe de bi herka hêsrان re derxin der. Hemû nas bûn, gelek ji wan hevalên min û te yên 30 salên hevaltiya me bûn. Birayê te Îsa jî li wir bû, her weha Şêxmus Özzengin, Hüseyin Polat, Sabahittin Topçuoğlu, Abdullah Irmak, Hesen Özkan û gelekên din. Ez bi hestên xwe mijûl bûm, di kêliya ku biranînên bi te re yek bi

yek li ber çavêن min didan dû hev. Di wê kêliyê de çavêن min bi Sebo ketin, mîna ku di nav dismala kaxezî de li tiştekî bigere, her ew tev dida, ne di rewşa ku li dor xwe mîze bike de bû, bi wê dismala ku rondikên xwe pê paqij kiribûn, xemgîniya xwe tenê dijiya. Ez bawer im, ew jî di wê kêliya ku min lê mîze dikir de bi hinek bîranînên xwe û te re mijûl bû, belki jî gelek ji wan wêneyên ku di ber çavêن min re derbas dibûn, di ber yên wî re jî derbas dibûn.

Ma di wê kêliyê de ci di ber çavêن min re derbas nebûn, Nebî! Me 30 ji wan 33 salên te yên li Almanyayê bi hev re derbas kirin. Kêliya me di rojeke payiza 1983 de li Campusazanîngeha Hamburgê hev nas kir hat ber çavêن min. Bi hemû jîndariya xwe naskirina min û te ya cara pêşin di ber min re herikî. Ji bo ezmûna HWPê ku te lê aborî dixwend, ez ji bo çend mehan ji Bingenê hatibûm Hamburgê. Te ji temenê xwe yê di bin bîstan re hîn jî ciwantir rê dida, enerjiya ku ji çavên te direşîya hêvi dida mirov. Te ewqas bi germahî ez pêşwazî kirim, hevaltiyeke ku heta koça te ya dawîn dom kir, pêk hat.

Piştî bi çend mehan min jî dest bi xwendîna HWPê kir. Rojên wan salên juntaya leşkerî, li HWP ewqas tije derbas dibûn ku heta vê dema

dawiyê ji her babeta sohbetên me, bûyerên wê demê bûn. Juntaya leşkerî nû hatibû ser desthilatdariyê, gelek karê ku em bikin hebûn. Tu di komeleya KOMKARê ya li Vereinstraße de endamekî aktiv bû. Ligel ku ez ne bi koma we ya siyasi re bûm ji gelek caran em bi hev re beşdarî xebatên KOMKARê ji dibûn.

Di wan rojêni dijwar de koma te ya siyasi hevalbendê sowyeta kevn bû, lema te bi hemû hêza xwe di navrêxistina Marxistische Studentenbund Spartakus (MSB Spartakus) ku yek ji rêxistinêni Partiya Komunist ya Almanyayê (DKP) bû de kar dikir, ji bo ku tu doza kurdan piçekî bi wan bidî pejirandin. Piştî bi salan te ê di sohbeteye me ya şevêni Hamburgê de ji min re bigota ku ew hewldana te gelek caran tu dianî ser sînorêni bêderfetiyê.

Tê bîra te wê êvara ku em çûn me li stadiuma Hamburgê di maçeke mezin de junta leşkerî protesto kir. Me li ser flameyke mezin sloganên li diji juntaya leşkerî nivîsandin û li jora wan ji bi tîpêni mezin navê dezgeha futbolê HSV nivîsand, mîna ku em alîgirê wê bin û siloganên me ji ji bo wê bin. Demeke baş dirêj piştî destpêka maçê pê derxistin, û hatin ji me re gotin ku divê em flmaya xwe daxînin.

Hîn di wan salêni destpêka 1980yî de her ku em dihatin ba hev nîqaşen me li ser pirtûkên ku me dixwendin bû. Çend mehekî ji me li mala min kursa Das Kapital li dar xist. Hefteyê carekê em dihatin ba hev û me pirtûka Karl Marx bi almaniya wê pel bi pel bi dorê ji hev re dixwend û gotûbêj dikir. Nebî, di ber henekên te û zimanê Marxî ku ne hêsan bû, lê tije ironî bû, kurseke çiqas xweş bû! Ew qursa das Kapital ji yek ji babeten sohbetên me yên piştî bi dehêni salan bû.

Ligel daxwaza te ya xurt ji bo zanînê û wan sohbetên me ji tu her parêzvanekî „Sistema Sosyalist“ mayî. Baş tê bîra min ku rojekê di nîqaşekê te û hin rexnegirêni siyasta sowyeta yekbûyî de hevalê te Aslan ji te re digot: „Nebî, ji wan nexwe, kesevê wan tune ye, lê yê te Sistema Sosyalist li pişta te ye“. Te baş zanîbû ku ez mîna we nahizitîm, lê tu demê ji bo hevaltiya me ew nebû asteng. Piştî bi salan her te bahsa wan rojan dikir, li gel kenekî ku tenê xwe di çavêni te re dida der, digot, ew tişten me dikir ne karê aqilan bû, lêbelê em gelek tiştan ji jê fîrbûn.

Piştî me HWPê qedand tu çû Kôlnê ji bo berdewamiya xwendina aboriyê. Ez ji ji bo xwendina tipê çûm Frankfurtê. Gelekên caran me

hevdu li Kôlnê didit û bîranînên xwe û havalтия xwe teze dikir. Tê bîra te carekê duduyan ne dema min ne jî ya te hebû, lê ji bo dusê saetan me li stesyonâ Kôlnê hev didit ji bo ku em bahsa rojêن xwe yên Hamburgê bikin. Di wê demê de tu berî nîvro dicû zanîngehê û piştiñîro tu di na-venda Komkarê de dixebitî. Her ku me hev didit gazinê te ji hevalêن te yên siyasi hebûn ku ew qedrê xwendinê û karê rewşenbirî nagrin. Ji xwe vê rewşê hişt ku tu pişti demekê ji wan biqeti.

Di wan rojêن ku tu ji derdora Komkarê qetiyabû de te carekê telefonî min kir. Ez li Frankfurtê bûm. Min heta hîngê tu ewqas bi xem nedîtibû. Te ji min re got divê em di demeke kurt de hev bibînin. Li ser îsrara min, te got ku tu ji hîngê û pê ve serbixwe yî. Te dixwest ku em di demeke kurt de hev bibînin, ji bo ku em projeya wergera hin berhe-man bi hev re bikin. Pêşniyariyeke te ya konkret hîn tune bû, lê te valahî nedixwest. Min dawiyê fam kir ku tirseke te ya zehf jê hebû ku hevalê te yên berê ji te re bibêjin tu ji dawî reviya û nuha jî bê berpirsyarî dijî. Ji bo wan û hîngê ji bo te ji xwendina li zanîngehê tenê ne bes bû. Min hîngê peyveke ku min berê ji gelek caran ji te re digot, dubare kir. Pişti bi sa-

lan te gelek caran di sohbetêن me yên ku her tije henek bûn de bahsa wê gotinê dikir. Hat bîra te, Nebî? Hîn di destpêka HWP de û pişti tu „serbixwe“ bû jî min digot: „Nebî, tu jîr î, pêdiviya me bi kesen wek te ku bi zanistê mijûl in, heye, kesen ku belavokan belav dikan pir in, divê tu bala xwe bêtir bidî zanistê.“ Pişti ku te koça dawî kir êvarekê Îshan, Sebo, Hesen û ez em rûniştin û me hin bîranînên xwe yên bi te re teze kirin. Tişte ku ez herî hestiyar kirim, hersî hevalan jî bahsa te û vê gotina min kir. Min heta hîngê nizanibû ku bandoran wan peyvan ewqas li ser te maye ku di civatêن ku ez ne lê jî bûm tu bahsa wan dikî.

Te gelek caran ji min re digot ji bo ku wenda nebin nivîsen xwe ne di malperêن internetê de, lê belê di kovaran de bide weşandin. Niha, pişti salek di ser çûna te re derbas bûye ez wateya wan peyvîn te baştir fam dikim. Daxwazeke wisa bi min re çedibe ku ez dibêjim xwezî ji minbihata û min karîba sohbetê min û te yên van salêن dawî mîna „Sohbetê La Pazê“ biweşanda. Ez bawer im dê berhemeke li gor dilê te jê derketa. Tu jî di wê baweriyê de yî ku dê navê „La Paz“ baş lê bihata ne wisa, Nebî? Bi taybet van salêن dawî me gelek caran êvara şemiyê (roja

înê) hevdû li wir didît. Her ku niviseke min nû derdiket, te di telefonê de bi kurtahî bahs dikir, wek ku tu bêjî min xwend ha, nivîsên te têxwendin. Ez dixwazim tiştekî ku min hîngê zehf eşkere nedikir nihabibêjim, her ku te dilxweşîya xwe bi xwendina gotareke min dianî zimên, kêfa min zehf dihat. Lê tu pê jî nedîma, her carê ku me li LaPazê hevdu didît, di ber mûzîka amerîka latîn re, te cardî peyv dianî ser babtê û glek caran te bi çavekî rexnegirî gotar ji hev vediçiri. Li gor te şeweyê min î nivîsê di şiroveya veşartî û wateya hevokan a ku di kêliya pêşîn de nayê dîtin de bû. Hîngê xebata te ya dissertationê di nav destê te de bû, lema sohbata me ya piştre jî li ser xebata te ya xebata doktorayê bû, ku min gelek sud jê werdigirt.

Roja ku me xatirê dawî jî te xwest (17.9.2012), em hemû li Volksparkê civiyan ser hev. Dê û bavên te û xuşka te ya bi jîritî û henûniya xwe li gor dilê te Zubêde û birayê te Îsa li gel xemgîniyeke kûr bi heval û dostêne te re bûn. Kurê te Serko di navendê de bû û xêrhatin li mîvanan dikir, her weha alîkariya diya xwe Ankê jî dikir. Kevaniya te Irmgard jî tev li diya xwe û hin kesên din li wir bû. Pismamê te Îsmail di tevahiya ayinê de wesiyeta te dianî

cîh û bê rawest kilama „hevalê bargiran im“ datanî ser. Xwezî te bidîta bê çawa bi sedan heval û hezkiriyêne te li wir bûn. Kek Şerefettin Kaya li gel nexweşîya xwe ji Kielê hatîbû, Îlhan Kizilhan ji Freiburgê, Mehmet Tanrıverdi ji Gießenê, Arşevê Oskan ligel nexweşîya xwe ya giran, Mehmet Şahin, Metin Incesu, Cahit Mervan, Güney Aslan, Faysel Dağlı û gelekên din.

Nebî, piştî te li vir tiştek ne mîna berê ye; Hamgurg hat guhertin. Kesek ji Hemburgê di redeksoyona Bîrnebûnê de êdî tune ye, ku her carê me li ser hejmara nû agahdar bike. Her weha di nav mîvanen sîla sor de jî kesek ji Hamburgê tune ye. Kesên ku bi dirêjahiya şevêne Hamburgê bahsa xebatêne xwe yên zanistî bikin jî êdî tune ne li vir. Kesekî ku nivîsên min bi çavêne rexnegirî bixwîne û rexneyêne xwe bi zimanekî mirov jê kîmasiyêne xwe fêr bibe jî tune ye. Di hevdîtinên min û Îhsan û Şukru yên vê sala derbasbûyî de gelek caran peyv dihat ser dilsoziya te Nebî, em lê zehf geriyan.

Min çiqas dixwest ku em van rojan li La Pazê bi hev te rûniştina û min li hîzrêne te yên di derbarê Kongreya Netewî de guhdarî bikira. Gelo te yên li ser helwesta rêxtisinên Rojava ci bigota, ku di van rojên

dîrokî de jî hay ji berpirsyariyên xwe tune ne. Hindik maye ku xelekek din ji zincîra pergala pişti şerê cîhanê ya li ser neheqiyê avabûyi, li Surî jî bîqete. Ez dizanîm ku tu yê bibişirya dema te bibhîsta ku hinek kurd van rojan naxwazin Amerîka êrîşê bibe ser desthilatdariya Baasê. Her weha min dixwest ku em bi hev re bahsa kirinên dewleta tîrk i vê sala dawî bikin, bê çawa bi lîstik û fenên xwe dixwaze kurdan careke din bixapîne.

Bêguman, me yê ne tenê bahsa van babetên tevahî bikira li LaPazê;

her weha min ji te re bahsa bûyerên taybet jî, min e bahsa kirinên Memo û Evdo jî bikirna.

Ev bû salek tu ne li vir î, ev bû salek em bêriya te dikin, Nebî!

14.09.2013

(Ev nivîs ji hin notên axaftina min a ku îro min li Hamburgê di civîna yekemîn salvegera wefata Dr. Nebî Kesen de pêşkêş kir û ji nivîsa ji bo roja salvegra wefata wî (11.09.2013) pêk tê)

Bîranîna Hevalê Hêja Dr. Nebî Kesen

Şeref Akgül (Xoce)

Mîvanên bi rumet, xuşk û birayên delal, ez ser navê Komita Navend a Komkarê û ya Komîta Rêvebir a Komkar Hamburgê we hemîyan bi can û dil silav dikim. Hurmetê xwe pêşkeşî we dikim.

Em îro ji bo bîranînek dilêş hatîne ba hev. Xwezî em ji bo ev tiştên ku rehmetî kek Dr. Nebî Kesen jê hezdikir û her tim bê westan bazdiyan, cîhê xwe digirt em bata ba hev û ew ji ba me bûya. Lê mixabin jîyana her insanî girêdayî demekê ye û ev dem ne destê kesayetan da ye. Wekî hun dizanîn me par va çaxana kekê

xwe ê delal wenda kir. Dilê me êşîya, em xemgîn bûn, valayîya ku wî dilê me da vekir hema tijî nebiye û zû zû jî tijî nabe.

Berku her kes dizanê Kekê Nebî di nav jîyanek çawa de hat û gişte ev merhela. Ez naxwazim dur û dirêj behsî wî bikim. Ez dixwazim ji ber minasebeta bîranîna wî de tiştin dilê wî de derbas dibûn û her tim ji bo ev tiştana hewl dida, qîret dikir ev hestên wî yêng welatparêziyê bibîrbînim. Ez bawerim wî jî ev tiştana dixwestin. Kekê Nebî tevayîya Evropê de, xaseten jî Almanya û Hamburgê

de gava ji bo Kurd û Kurdistanê, warê diplomasî, aborî ziman û nivîsandinê de cara yekem dahate bira hemû kurdan. Ger kar û barê ku te dikir bo Kurd û Kurdistanê bana qicik mezin, pir hindik be, digot ci tes batana dikir. Wî hê jî; tişte ku ji bo kurdan hewceyekî mezin e, rixistin û saziyên kurdan pêk neanîne jîyana xwe ya rojane de pek anîbûn. Ev ci bû, ev yekîtiya kurdan bû.

Disan dixwazim bi tespîtek rewşenbîrekî wek kekê Nebî, bi qedir û qîmet Av. Osman Aydin axaf-tina xwe bi dawî bikim. Av. Osman Aydin her tim divê ji bo sê sedeman min ji siyaseta aktîf destberdaye. Ji wan sedeman de ya mihîm siyasetê de tunebuna wefayê ye. Bo ev nesîhera kek Osman hèvî dikim ku hemû kurd ev tespîta bigrin ber çavan. Gelên wek me bindest nikanin zû kesên zana û dilsoz weynin holê. Em jî lezime qîmeta rewşenbîr, zana, hunermend û reberên xwe bizanin.

Disan bi nesîhetik hevalê xwe yê hêja ku berî 12 yê îlonê li Bingolê bi destê faşistekî ve hate şehidkirin,

dixwazim bir bînim. Ev havala Av. Şakir Elçî bû. Dema xwe da welat-parêzek dijwar bu. Di semînerekê da, ji me xorstan ra waha nasîhat kir.

Digo; "Tu kes bira pesnê xwe nede, newêje min bo Kurd û Kurdistanê aha kir, waha kir. Hetanî ku Kurdistan azad nebe. Diwe ku ev azadî demek dur û dirêj bidome. Wê demê de keda ku bo Kurd û Kurdistanê hatî kirin jê re bê hurmetî nekin. Qedrî wî kedê bizanîn'

Ez disan bi minasebeta biranîna Kekê Nebî Kesen, hemû kedkar û şêhîdên Kurdistanê, bi can û dil, bi bir tînim. Bejna xwe ber wan de ditewînim.

Ji bo Kurdistanek azad jîyana xwe ya mayî de her tim soz didim wan xebatên xwe gorî quweta xwe di-domînin.

Seri da Malbata Dr. Nebîr û we hemû dostên wî re serxweşî dixwe-zim.

Bimînin di xêr û xweşiyê de.

Nevanda Komkar Almanya

14.09.2013

Hilbijartina cîhwariya adara 2014an

Di bihara 2014an da, li meha adarê helbijartina cîhwarî (herêmî) li Tirkiyê û Kurdistana Bakûr heye. Redaksiyona kovara Bîrnebûnê bi minesebeta vê helbijartinê pêwîst dibîne ku bala xwendekar dost û hevalên xwe û ya kurdên Anatoliyayê bikşîne ser giringîya tevlîbûna vê helbijartinê û dexwaziyên ku em jê dipêni.

Em bang partî û namzetên wan dikin ku dexwaziyên han jî yên ku li jêr hatine rêzkirin li xwe mahr bikin û ji bo bîdestxistina wan bixebitin. Em bangî helbijêran dikin ku ew di helbijartina şaredarî û muxtariyê da, wexta raydanê, van xwestinan li ber çavan bigrin. Wana bikin pîvana raydanê û bicîhanîna wan ji parti û namzetên wan bixwazin:

- Bikaranîna zimanê kurdî di karê propaganda û kombunên helbijartinê da!
- Naskirina xelkê kurd û mafê wî yê çarenûsî bi awayê fermî!
- Perwerdeya bi kurdî, kêmtir dersa kurdî ya ferz, ne ya helbijartî!
- Îstifadekirina ji imkana dersa kurdî ya helbijartî û ji bo vê teşwîqkirina xelkê wan cîhwaran!
- Navlêkirina cîhwaran bi kurdî be jî. Gund, qesebe û qezeyên kurd yan jî kurd jî lê wekî nîstecîh dijîn û yên cade û meheleyên wan duzimanî, bi kurdî û tirkî bin!

Kongreya Netewî ya Kurd (KNK)

Nuh Ates

Ez ji mîna pir kesan bi nûçeya di derbare kombûna li Hewlêrê bi armanca haziriyên demezrandina Kongreya Netewî ya Kurd da pir şâ bûm. Vê nûçeya bi xêr pîveka hêviya bi dawî anîna şer û azarê navxweyî û ya bidestxistina mafê çarenûsiyê bilind kir. Min ev gavavêtina tarixî pîroz kir û du cara derheqa hen mijaran da merem û mirazên xwe pêşkêsi komiteya amedekar ya KNK kirin.

Mixabin pir neajot, şadîya ku ji vê gavavêtina dîrokî hatiye û tê belav kirin bi siya hen rûdanê nexwes û rexneyên neyariyane di navberê hen partîyan da herimî. Ev rûdan û du cara paşvaxistina demezrandina Kongreyê û sebebê wê nişanî me didin ku kar û xebata amedekirina KNK baş nehatiye kirin. Min di pêşniyarên xwe yên ji komita amedekar ra ji anîbû ziman û gotibû: „Mixabin, demezrandina Kongreyê û haziriyên wê di demeke pir kin da pêk tê. Xwazika wext zêde bihata veqetandin, şesmahekê yan salekê li ser mijarê Kongreya Netewî lêkolîn,

minekeşe û dan û standin bihatana kirin“

Ji bo demezrandina Kongreya Netewî ya Kurd û birevebirin û serketibûna wê, lihevkirina aliyên siyasi û civakî li ser çend stûnen esasî pêwîst e. Xwazî û diviya bu ku beri kombûne ji bo demezrandina KNK û tespitkirina tarixa wê alîyên besar li ser çar prensiban û xal û mijarê bingehî yên ku ez ê li jêr qala bikim lihev bihatana.

Yê yekêmîn mafê çarenûsi ye.

Mafê çarenûsi wekî makprensîbe KNK heq û xwazteka miletê kurd ê rewa bê qebûl û êlan kirin. Mafê çarenûsi mafê xwebûn û xwebixwe idarekirinê ye. Mafê çarenûsi ji bo miletê bindest ên ku welatê wan hatiye dagir kirin û parce kirin tenê derfeta cihêbûnê dernaxe holê, her weha ew derfeta bi îradeyeke azad bi hevra jiyanâ bi miletê din va ji derdixe meydanê. Piçûk û mezin, ew mafê her xelk yan miletêkî ye û rewayî kurdayê ji. Mafê çarenûsi xwedîbûna welat ji hembez dike. Tu kes yan hêz û hizbek

nikane û heqê wî jî tune ku vî mafî ji bo kurdan încar û paşguh bike û li wan biherimîne. Di ser vê prensîbê ra gavkirin û yan jî paşve avetina wê naye qebûlkirin. Gereg e ku di derheqa bîdestxistin û bikaranina mafê çarenûsî da, di bin şert û mercên dema me da, bernameyek/nexşerêyêke KNK ya ku endamên wê li ser lihevkiyê berî kombûna resmî ya demêzrandin KNK hebe û hebûya. Pêwîst e ku KNK hududênu ku li dijî iradeya gelê kurd hatina kişandin û Kurdistan parce kirine neheq û nemeşrû biwesifîne. Di derbara bikaranîna awayê mafê çarenûsî di şertên iroyî da li her parçeyê Kurdistanê, çêtir e ku kongre xwe li modelê Başûrê Kurdistanê bigre.

Yê duyemîn, lihevkirina li ser sonda tifaqek û yekrêziyeke pît e û qedexeye şerê navxweyî ye.

Li gor vê sondê, her endamekî KNK bê şert û merc jî her cûrê şerê naxweyî ci yê hûndurî rexistinan xwebixwe û ci yê li hember endamên din ên KNK fereget bike. Xal û xelkeya hessas û zeyîf ya kurda a ku neyarênen herdem jê istifade kirine û dikin ev e. Ü bê şik garantor û sigortaya herî mezin a serkevtin û berevaniya kurdan û welatê wan yekrêzî û tîfaqa wan e. Nabe û ne rewa ye ku ci ferd û hêz,

ci partî û komele bi hev ra şer bikin, tundtûjîyê li hember hev bikar bînîn û bi gîlûgotin û rexneyêneyartiyê hevdu sor û reş bikin. Van heslet û taybetane, di ber giştan lazim e ku hêz û hîzbênu kurd, wekî endamê miletékî bindest û welatekî dagirkirî û parce kirî û bi zimanekî bendkirî, li xwe heram bikin. Lewma pêwîst e meriv li ser vê mijarê kûr û hûr bisekine û avakirina lijneyeke (komisyoneke) herdemî damezrîne, Lijneya Hevkarî û Arişeyê Navxweyî. Ü derheqa vê mijarê da gereg e prensîbênen bingehîn û mekanîzmayen çareseriya arîşeyê navxweyî yênu ku meriv pê tifaq, diyalog û hevkariya navxweyî pêşva bibe û bikana pê kes û hêzên ku van prensiban binpê bikin poşman bike, bênen nîşan kirin.

Yê sêyemîn bikaranîn û parastina zimanê kurdî ye.

KNK divê xwediyê bername û nexşereyeke ziman kurdî, zarawa û elfabeyê wî bê. Li gorê vê, elfayênu ku hene û tênu bikaranîn û zarawayê kurdî wekî zarê resmî yê KNKê bênen bikarnîn û qebûlkirin. Pêwîst e bernameyeke siyasî ya KNK di derbara parazzin û pêşvabirina zimanê kurdî û zarawayê wî, bi taybetî yênu li berbîrbûn û wendabûnê da hebe.

**Yê çaremin beşdari û
temsiliya Kurdên dervayî
Kurdistanê û dezgeh û saziyên
wan e.**

Cihê gotinê ye, kurdên dervayî cografya Kurdistanê gîst nc wekî hev in. Ji ber taybetmendiyêñ wan ên bingehî, pêwîst e ku ew li ser du beşan bêñ parvakirin:

1. Kurdên Anatoliyê, Xorasanê, Welatên Yekîtiya Sowyeta berê. Kurd li van welat û deran wekî koloniyêñ ctniyî di nav piraniyêñ cihê da ne û xwediyyê ziman û kulturne xas in.

2. Kurdên koçber yên li wclatên Awrupa û welatên din yên dinyayê.

Kurdên vê beşê, xwasme yên li welatên Awrupayê piranî koçber in û ew jî xwediyyê taybetmendiyêñ din in, lê ne wekî yên beşa lan in.

Lewma min, bo nimûne, di pêşniyarêñ xwe yên ku min ji Komîteya amedekar ra şandibûn, ji bo endametî û beşdariya di kombûna demezrandina KNK da, Elî Çiftçi wekî nûnerê saziyeke serbixwe pêşniyar kiribû. Ew kurdê Anatoliya û cdîtorê kovara kurdên Anatoliyayê, Bîrnebûnê ye ya ku ji sala 1997 vir da dertê.

Almanya, 18.09.2013

Bawerîyêñ ecêb

Adem Özgür

L i ber komputûrê rûniştim û min dixwest ji bo hejmara Bîrnebûnê ya nû re nivîsekê binivîsim. Lê, tu tişt nedihat bîra min. Li ser dawerên aliyê me rûpelik nivîsand, ew ji kêm bû. Hê neçûm dibistanê min pir dixwest nivîsake din jî ji Bîrnebûnê ra bişînim. Paşê mezinekî gundi me hat bîra min. Wî, li ser kula dixwend. Êdî min mijarek dît û dest pêkir:

Berê gundi Hesarê "**ocax**" hebûn, li va ocaxan him dua dikirin, him jî nivîst dinivsandin. Bi wan ra digotin **mala ocêx**. Rojekê, em jî çûyîn wira. Xaltîka min bin xewê da ditirsî, ji bo wê çû mala ocêx. Ji xaltiya min ra nivîst nivîsandin. Wekî din jî; ji bo bêxewê, ji bo çavînî û ji bo newxaşiyê derûnî nivîst dinivsandin.

Mezinêñ me dema dihatin cem hev, ji hev ra qala demê berê dikirin. Mijaren wan giştî li ser tiştên tîrsê dibûn. Digotin "min li filan gundi jinikek/meri-yek did xwe kiribû qelafatî yekî din..."

Pîrika min Rehmîkê Eli, li çiyê kûşkûr berhev dikirine, li hemberî xwe cîrana xwe dîtiyê. Bang wê kiriye "Gulê! Gulê!" Gulê nebihîstiyyê. Pîrika min hatiyê mala xwe, mezeki-

riye ku cîrana xwe Gulê li mala xwe ye. Hal ew e ku Gul, neçûyi tu deran!

Va salana Kurdên Anatoliyê Navîn pir terin Semsûr (Adiyaman) Menzîlê. Li wir seydayek heye, ew ji irqa pêxember te ye (ew wûsa bawer dîkin). Gundiyêñ Xelîkê Qerejdexê pir diçûn wir, otobûs digirtin, jîn û mêt cûda diçûn. Li 2006an ez jî bi wan ra çûbûm Semsûrê, heta ber vê tu agahdariya min tûnewû derbarê Menzîl û Seyda da!

Li wir; kê dua dikir, ke qîre qîr dikir, kê jî nimêj. Lê Seyda, ne sohbet dikir, ne jî teva civatê diwû! Ew, demê nimêjan dihat, nimêja xwe dikir û diçû. Nimêja Êvarê bêdeng rûdiniş, xwestinêñ kê diwû, wan bi parastinêñ (ew nebêjin parastin, dibêjin mubarek) dora Seyda ra digotin, wî jî li ser xwestinêñ wan dua dikir(?).

Li destê minî çepê balûg derketi wûn. Hê neçûm newxeşxanê li dora min her kesî di got "Here cem Besê malê Hesiki Rehmê, ma li ser balûgen te biuxîne." Min li pêş qebûl nedîkir, lê bêçare çûm cem xaltiya Bes, xaltiya Bes jî min ra got: '**Here, roja çarşemê were û demê tû disa**

*batî mala me, balûgê xwe bemcire,
çend balûgê te hene ewqes ce hûne.”*

Roja çarşemî hat û ez çûm mala xaltîka Bes. Bi xwe ra kulmek jî ce bir. Her ceyek, di balûgeka min dida û dûa dikir. Min bawer nedikir, lê min xwest ji ber şorêñ her kesî xelas bibim û hinek jî meraq dikir. Xaltîka Bes got, “*ce li dereka bênik û li dereka bilind biparêze. Ku ew hişk bûn, balûgên te jî hişk bibin...*” Lê, ne ce hişk wûn, ne jî balûgên min...

Dema min di got tiştên weng nerast in, ji min ra digotin; “*baweriya te tûne, lewma!*”

Ez him bawer nakim, him jî ji bo balûgên destê xwe çûm cem çar û pênc jinika. Yekê li ser genim dixwend, yekê tû dikir dixwend, yekê jî destê xwe li ser balûgan digerand û dua dixwend, hwd...

Rojekê jî ez çûm gundê Beşkavaxa Mezin, li vî gundî jî jinikeka pîr hebû, cara pêş newxest li ser balûgên min bixîne; ji ber ku destê xwe nedide mîran! Paşê qebul kir û weng got jî min ta: “Roja pêncsemê were, lê şevê heyveron were. Wekî din qebûl nabe!..” Me jî bi şora wê kir û roja pêncsemê, şevê heyveronê çûyîn mala wê. Li ser rûyî min tûkir û gêzika gemar di dest û pîyê min gerand û got “*qey meraq neke, baweriya te bû; balûgên te di mehekê de derbas bibin!*”

Nizanim, baweriya min tûnewû lewma derbas newûn balûgên min? Tû kirin, gêzika gemar, şor nehîştin!..

Li gundî me apê Mehmed hewû, Mehmedî Mestî Yaylê, wî jî li ser kula dixwend. Berê li ser kulê tûdikir, paşê mist dide, dua dikir paşê jî bi pêñusekê xêz dikir li ser kula. Jê ra digotin *mirîstan*.

Niha, li gundî me ji bo mirîstanê kesek newxîne. Ew jî bîrbûn!

Li gundekî Heymanê, li serî çiyayekî kanî hewû. Navberê wir û gundî me 90 km heye. Ez biçûk bûm, teyê bîra min em çûyîn wira, roja em çûyîn wira, pir kesen din jî hatiwûn. Ava wê kaniyê dihat firotin. Her kesî ji bo şifayê bibîne dihat ava wê kaniyê vedixarin.

Ava xwedê, bipereya difroştin, digotin ew ji bo newxeşîye şekirmiz pir rind e! Kesen anatoliyê navîn pir diçûn-dihatîn wira.

Li her gundî, li her malê û her kesî çirokeka xwe ya weng heye. Ji bo tiştên weng ez pir geriyam, min pir tişt dîtin. Me, zanistî hiştin, em çûn bi baweriyê- tiştên pîrejinan (kocakarı) dikirin. Lê, ew nerastin!

Çend nimûne ji klamên şînê

Nuh Ateş

Gava ku ez havîna îsal çûme gundê Xelika (Kulu-Konya), di serê min da çend fikir û poreje hewûn. Yek ji wan jî ev bû: Min dil hewû çend klaman berhev kim û di bîrnebûnê da biweşînim. Merivekî xelikî heye, digotin ew î, kevn û nû, pîr klamên Xelika û yêñ gundêñ cîran eżber dizanê. Bi gotineke din, ew ï mîna arşiveke zindî ye. Niha ew ï malnişîn (teqewud) e û wexta xwe geh li gund û geh jî li Almanyayê derbas dikê. Min ji xwebixwe ra got, ez ê herim ba wî û klamên ku ew pê dizanê pê bi gotin bidim û wana binivîsim yan jî li ser şîrîtê qeyid bikim.

Rojeke, min haziriya xwe kir û bi eşqekê çûme mala wî. Em rûniştin, ji xalxatir pirsîn û xwaşşohbetekê bi şûn da, min mirazê xwe jê ra got. Di pêşiyê da min ew him pesand û him jî pê hesand got, „eğer imkan hebe û yan jî ku ez xwediyyê meqamekî biliñ bim, ez ê xelateke mezin bi te da kim!“ Bi ser vê gotina min da, rûyê wî nerîm bû û kenekî sivik bi lez li ser belav bû. Wî hema li min vegerand got, „tu sax bî, xêr e, çima, ma min çir kiriye...? Min da ser û got „sewa

ku te evçend kilam eżber kirine û di serî xwe da mîna arşivekê komkîrine tu rewayî xelatkiranê yî! Lê ku te ev kilamên di serî xwe da li ser xetê (kaxizê) û şîrîtan qeyid nekirin û ji nîşen li paş me ra cîhnehîştin û bi xwe ra birin goristên, pîr heyf e û hingê gerek e ku meriv te lenet ke!“ Vê carê jî wî rûyê xwe qerçimand û mirûztırs kir û got, „ew îşa nabe...!“ Ez li ber geriyam, bi ber dil da cûm, lê ew kete ïnade û klamek jî negot, nexwazt ku bibê. Sebeb jî negot. Ne cihê xwe ye, ku ez li ser çîma negotina wî spekulasyona bibêm. Dirêj nekim û serê we neêşînim, li dawiyê ez bi xema destbetaliyê û tozikê jî bi hêrs vegeleyam mal.

Li mala bavê, êvarê min ji brayê xwe, Husê Hecê ra qala vê serpêhatiyê kir. Husê ji min ra qala çend klamên şînê kirin û ji wan çend rîz ji min ra gotin, min jî ew qeyid kirin. Min dilê xwe bi van kilamên ku Husê gofi aşt kir. Sewa ku ez destbetal venegekim Almanyayê û çûyîn û lêgerîna min ber tiştekî bigre, min xwazt ku ji wana wek nimûne çend rîzan ji devî Husê û ji devî hen kesen din li jér pêşkeşî we bikim.

Berhemên folklorî yên cîhûwarên kurdêن Anatoliyayê hetanî niha, ku meriv bi tevayî lê binihêre, kêm hatina berehevkirin û nivîsin. Xwêndevanê kovara Bîrnebûnê dizanîn, ji çerok, klam, gotinênen mezinan, bêjê, yarenî, lîstok û yên din gelek nimûne di kovara Bîrnebûn da hatin weşandin, di ber gîstan jî klam. Li her gundekî bi dehan, bi sedan klam hatina lihevanîn û strandin. Piraniya wan nehatine berehevkirin û nivîsin. Ku li van salana nehatin berhevkirin û nivîsin, ihtimal heye ku ew ji bîr û wenda bibin.

Reheke (damareke) bi hêz û berereket a folklora kurdan bêşik klam in, afrandin û strandina wana ye. Meriv li ba kurdêن Anatoliya jî raste vê huneriya gelerî tê. Hosteyên vê hunerkariyê, xasma ya lihevanîna klamên şîna bipiranî jîn in. Tû yê bibêhî, kirdarê (failê) lêkerê (fielê) strandinê jîn in. Li ba kurdêن Anatoliyê, ji kesên jêhatî yên ku kilamên xwaş û bitîn û jî hêla zimên, navarok û lihevanînê da dewlemend û menedar çê dikin û distrêñ ra dibêñ, „şare“. Ev navlêkirina pir cara ji bo jîna tê bikaranîn. Meriv dikanê bibê, li gundêñ kurda yên li Anatoliyê pirtir du çeşîd kilam têne stran, klamê şîna û yên dilan. Ku kêm bin jî, klamên li ser egitan û van

salêñ dawîyê li ser şehîdan jî hene.

Di serencama vê pêşgotina kurdâ, meriv dikane bibê, ku kan û makmotifa lihevanîn û strandina kîlamân ya sereke êş e. Eşâ jî ber mirinî, afet, jihevveqetîn û dûrketin û dilen ku negihêştinê mirazê xwe ye. Ev êşâ ye ku, pir cara bûye û dibe sebeba lihevanîn û strandina klaman.

KLAMA MİRİYÊN MALÊ HECBEKIR

Ev klama Gula Hecî Titê (ji Xelikê Jêr= Golyazi-Cihanbeyli Konya) li hev anîye û sraye. bi tehmin 50 salî di ber vê li ser miriyênen mala Hecbekir, li ser Heskê û Husikê Îsmeel yên li Xelikê Jur (Karacadag-Kulu-Konya) sraye. Min çend gotinênen vê klamê yên li jêr ji devî Husê Hecê (ji Xelikê Jur) nivîsin. Husê jî ew ê ji dîya xwe, Fata Hecî Hemê û xwanga xwe Mirca Hecê hevisine.

dilê min tin e tin e

ne polad e ne hesin e

felekê mîrê malê HecBekirê ehmaq dîne
ê bi kinca va li bin ezcîl ramedîne
goristanê Qerecdaxê şen kirine

mîri felekê dosyê xwe jê tijî kirine

Zêwê Îsmeel bi min ra got ka birayê tê
li ku ne

Min go, sewa geçima dînyê ji Tirkîyê
bi derketine

dilê min têlê tembûrê

kamyonciya barê xwe helnan çûne

Semûlê

Zêwê ûsmeelê wexta ku birê min mîna

yên te bi kinca va gér bûn

Dawşen û Birtalkê kilamê min kirine

blûrê

ew çi siweke pe min zû té

giyayê qereca li rû té

Balekwîra ez qewitandim

go, here sulalê te a malê Hecî Tîtê

....

berfa Romê lêkir venekir

rêwiye kî me li Yaylê Malê

Torê şerpeze kir

kekê min i kurik heurânî

bi yamçî ecer li dawiyê odê malê

Milosmên rûnişt

şaleki bi pine li xwe kir qe deng nekir

....

Dupî: Bapêç, pûk

Yayle: Zozan

KLAMA HECÎYÊ FATEQIRÊ

Va klama jî bi tehmîn sed salî ye.

Hecîyê Fateqirê (Xelikayê Jur) li ser xwe straye. Nexwaşıya bînemîyê (sarayê) li ser bûye û ji avrûyê wê da pir bela hatina serî. Carekê li ber tandirê kîncê xwe diguhêrine, têda-hatiya nexwaşıyê pê digre, û bi destta dikeve nav arî tandirê... Ev çend rîzên jê vê klamê yên li jêt jî min ji devî Husê Hecê nivîsin.

Ferheng:

Sraye: Straye

Semûl : Stembûl

Geçim : Dewar

Dawşan: Omera (Bi tirkî Tavşançalî, Kulu-Konya)

Birtalk: Bîrtalik gundêkî bi ser qezeya Kuluyê va ye

....

pezi Malê Îdê meçêrîne

*li avê Çingirliyê delav bi delav megerîne
merivê bira dilgawiro go,*

here xwe bi arî Fateqirê bişewtiîne

dêra ku min gotî ne tu dêr e

ji qeytanê berda kér e

ma gerbûma li paş malê bêrê

DUPİYA HECMISTEFÊ

Van çend gotinênen menedar yên li jêt di klama Zexa Mestê (Ji Xelikayê Jur)da derbas dîbin. Zexê li ser Hec Mistefê straye. Hec Mistefa belkî sed salî di ber vê, vi ber dupiyê ketiye û miriye. Ji Zexê bi şûn da jî Zêwa Çûç ewê straye û belav kiriye. Min van çend gotinan jî devî Husî Hecê wergirtin.

*ma nigî min bişkesta, bigeriyama
bi dêre
ma negotana şivanekî bi kér û asûnî
ketiye ére*

*dame dame Zêwa min dame
Zêwa xwe bir li Konyê kire xanîkî bi came
ez çûm ba tuxtirê Konyê
go, dê gawir e këskê islam e*

ZËWO

Eşa Malê Xechem li ser keçika xwe, Zewê gotiya. Zêwê li lawikî Fatê Mestî Nazê bi desgîst bûye. Ew ê ji ber birineke di junî da bi tehmîn 150 salî di ber ve dimre. Birineke bi destî dîya xwe. Li gorê ku tê qalkirin, Eşê li ber tevnê bûye. Keçika wê Zewê jî li dawîya tevnê bûye û ji dîya xwe kêt xwastiye ku pê masûr bibirre. Dayikê jî kêt helnaye û berve wê çeng kiriye. Kêt di juniyê zewê ra dihere xwarê. Birina wê xwaş nabe, çerxe kangrenê dike û li dawiyê Zêwê pê dimre.

....

*Zewo Zewo Zewo Zewo
mirina xwe hatiye bi destî dêo*

*Zewo Zewo Zêw delalê
va sê sù ne di camiyê gundi Xelika da bêhevalê
li ketê li ketê Zewo li ketê
cénigê Zewikê min ê ji belgî xetê
Üsî Malê HecBekiro heqsiziyê meke
destê dê kelebçe ke peve bavê hebsa Yozgatê
va çiyana bi leme lemiştin
qırık û qertelê lê daniştin
gundino je min eciyo bigrin
cenezê keçikê min pe min şuştin*

*habû habû Zêwa min habû
güçikê şarê li seri ba bû
lawikê Fatê Mestî Nazê ji eskerê hatiye
nizanim ku Zêwo di qebra xwe da giri,
nizanim ku şâ bû*

HESPÊ ÎDÊ

Belkî 50 salî di ber vê, Fata Omer (Xelikê Jur) klamekê li ser miriniya hespê Îdikî lawê xwe sraye. Îdê lawê xwe hîngê bi dergistî ye. Wî zamanî hespê bi qiymet bûn, dewlemendiya malan bûn. Min ev gotinên li jêr yên vê klamê ji devî, pixaltiya xwe Eşa Erew nivisî.

....

*girê darê li hemper e
pulixê Îdikê maye li ser e
hespî Îdikî min i biha ye
bedelê heft motira ye
qeline bûkê min i nedaye
Îdikî heta siwe da bi qamçiyê bi ser ra
dawestiyaye*

*hespê Îdikî min birin
morî û maşlah ji sù kirin
bi Îdikê xwelî vi ser kirin*

.....

Ferheng:

Sû: Stû

HEMÎD

Klamê li jér, dayka min, Fata Hecî
Hemê li ser lawikê xwe, Hemîd si-
raye. Fatê ji Xelikê Jor e. Lawê wê,
Hemîd xwestibû ku jîyana xwe bi
dawî bike û ji ber vê bi dabanceyê li
dawîya gund, li ser kaniya jêrî li xwe
xistibû. Çel royî di komê da mabû.
Min çend rêzên vê stranê ji devî jîna
Hêmîd, dotmama xwe, Xecê Bêktêş
nivisîn.

....

*bejna Hemîdî min şiva ter e
ma bi ser Altîlera xopan da wernegere
ro êkundiye, ro zewal e
were li mala xwe vegere*

*serê hemîdî min ci bi saz e
bi diyarê kaniya jêri ketim
dengek bi ser min ket
nizanim quling e, nizanim qaz e
xwe çê meke medêrîne
gustilkê ji jur da berde di dawiyê ra biderîne
Hemîdî minî ku bun tewê
piştbazê dost e, qılçixê çavî dujmin e
mala Hemidi min ê li dawîya gund e, di gêli da
teksiya Hemidi min ê sor di dêrî da
bihata mîl min malî Hesê gî lê bida
bihata cêñ Melihe û Xecikê xwe bi deriyê da*

*çavê çend in çavê çend in
bruyê di ser ra li govend in
pênc lawikên min ên din hene
gî li herdé Hemîdî min izzend in*

.....

AGAH'DARYEKE GİRÎNG


Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di **Bîrnebûnê** de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyêن kesên ji malbatê (jin-mêt), bi kinc û tevgirêdanêن kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopyiekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenedîya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

HEC-MEMED

mêvanên li odê runiştine
hec-memed li nav tune
birangê minî ketiye nav ciya
ji ber jana kezebê nalenal e
rehmika malê heyder li ber dev tune ku
êşa birayî min ï delal aşt bike
da were birango were
vegerîn pir zû hat ber derî
hestexanê huddingê bişawite
ê bê merhemet e
doxtir li heniyê birayî min got
derdî te yî bêderman e
bask û milên birayî min şikeştin
deng jê derneket
mat bû
bi çavan ji doxtir pirsîya
dêmek omди teve bû?!!!
me herduya pi rê da
hûr û hûr barand
û
çemên hêsterkan me bi hundir da herikand.



Seyfi Doğan

Sersaxî

Li vê havinê, birayê endamê redaksiyona me Seyfi Doğan,
Hec-Memed çû ser heqiya xwe.

Em li vir bi ser navê redaksiyona Bîrnebûnê dibên; serê kekê Seyfi
û hemû malbatê sax be!

Yezdanê dilovan rehma xwe lêke û ciyê rehmetî bihuşt be!

Redaksiyona Bîrnebûnê

FELEK Ú TORE

Mem Xelîkan

Dema qîrinîyek kete nav gund, tevî hevliyek mezin êş û tirsek giran dikeve dilê Eşê. Piştî demek qut, li ser kèleka xwe gêrdibe û bîrve dihere.

Ew hîna heyjeh salî û keçikek bi dergîstî bû...

Dergîstê wê Îbram nexweş dikeve. Di nexweşxanê da, ji du mehan zêdetir dimîne lê bi kula penceşêrê re baş nake. Ew kula pîs, di demeke qut de bedena wî dihêlinê û tevadike.

Dayika Eşê, avê li serçavêñ keçika xwe dike. Dema Eş hisyar dibe, xwe bi xwe wiha dibêjê: "Wê li minê, ez çi bikim ciran û hevalno! Ew hé xortekî ciwan bû. Ax bê heqo! Te ez bi tenê hiştîm çûyî kuderê? Ka te digot ez ji te pir hezdikim? Bibê, ka min li te çi kiri bû? Hezkirina te evqas e, lo! Te hemî hêviyên min bi nîvî hiştin Îbram!" Û tevî şîna xwe, dest jî diavêje pore xwe û dirûçikine.

Ciran û hevalan, nedikarîne Eşê çawa rawestînin. Rewşa wê qet baş xuyanedikirîye. Gundî li hemberî Eşê, wek neçar û xemgîn dîbin. Eş, bi mistan li singê xwe dixe û van peyvan dubare dike; "Îbram Îbram! Bê te çawa

bijim nizanim. Ezê çi xwelîyê bi serê xwe bikim. Gelek xiyalêñ me hebûn Îbram! Te çîma wusa kir lo lo!"

Dema Eş dayîbûne Îbrêm, ew hê şanzdeh salî bûye. Qet bi wê netanişîne (neşêwîrîne). Bavikê wê û yê Îbrêm, di navbera xwe de bîryar dayîbûn e. Eşê, hay a xwe ji tiştekî tunebûye. Bavê wê, bi wê re tenê ev gotina kiriye: "Eşê, min tu dayî lawikê Heso." Eşê, qet tu bersiv nedaye bavê xwe. Edet û tore werg bûne. Bav û dayikan çi digotin ew dihatîye qebûlkirin. Tu heqî (mafî) keç û xor-tan tune bûye ku, ji bo zewacê ray û ramanêñ xwe bînin zîman. Lewma dilê wê dikirîye kute kut.

Hê dil û evîn çi ye nedizanîye...

Wê sibehê hevalêñ Eşê têñ û wê pîroz dîkin. Eş, ji hevalêñ xwe dipirse: "Hevalno! Ez dergîstê xwe qet nasnakim. Ka bibêñ hela ew xorkeki çawa ye? Li gora gotina dayîka min, ew du salan ji min mezintir e. Mala wan ji me dûr e. Ji bona wê min tu caran ew nedîtiye. Hûn nasdîkin an ne?"

Dayîk û hevalêñ wê, hertim digotine ev bextê te ye...

Çendek roj bi şunda, malbata

Îbrêm bi güstilkek û çendek bazingên zêrîn Eş xelat kirine. Piştî sê çar mehan, şevekê Îbram hatîye dergîsta xwe bibîne. Eşê dergîstê xwe wê şevê naskirîye. Xortekî çavşîn, esmer û şorxwêş bûye. Siftê, herduya ji hev fedî kirine û li çavên hevdu qet mîze nedikirine. Piştî wê şevê, di navbera herdu ciwanan da eşqek mezin peyda bûye.

Rojekê, Îbrêm destê Eşê kiriye nav destên xwe. Wê gavé xu (xwê dan) li Eşê dikeve û pir fedî dike. Ew cara siftê bûye ku, destê wê bi destê mîrekî dibûye. Îbram, xuya enîya dergîsta xwe paqîj dike û enîya wê radimisîne. Herdû ciwan, bi awayeki bextewar dest bi hezkirina xwe dikin.

Lê mala felekê bişevite, miradê wana nebirîye serî. Piştî çendek mehan, Îbram nexwêş dikeve û ji nexwêşxanê venagere. Xopana penceşêrê bi serdiikeve û meyîtê wî, ji Eşê re dişînin.

Dema Eşê şîna xwe dikirîbû, porê serê xwe ji dirûçikandîye. Hevalan arîkarîya wê dikirine û pê re wiha di-gotine: “Eşê, piçek sebr (tebat) bike, qey Xwedêyi mezin e! Tu kesî bi girî û bi lixwexistinê mirî bi şunda neanîne. Tenekê dilê xwe fireh bigire.”

Eş, wiha bersivê dide hevalên xwe: “Ew ci qedere û kê nîvisandiye? Ez ê ci bikim û bi ku derê ve he-

rim? Ci xuwelîyê bi serê xwe kim.” Dîsa li singê xwe dixe û dîsa dest bi por rûçikandinê dike. Êdî ji xwarin û vexwarinê da ji dikeve. Di çavên wê da, hêstirk dîbin wek baran û bi wî awayî dadikevin xwarê. Û şîliya hêstirkan ji, li ser rûyên spî da yek bi yek diheriqîn.

Hê çelê mirina Îbrêm derneketi bû. Bavê Îbrêm, bi bavê Eşê re ev gotina kiriye:

-Xisim, tu edet û torayên me dizanî. Eş her çîqas keçika te be ji, ew êdî bûka vê male ye. Lawê min Îbram, çû ser heqîya xwe. Ez naxwazim bûka min ji vê malê biderkeve. Ji îro şunda, Eş dergîsta lavê min Memê ye.

Bavê Eşê: Ez li ber adet û toreyên me stûxwar im. Lê Mem hê sêzdeh salî û zarokek e. Hema hema pênc salan ji Eşê bi çûktir e.

-Bila biçûktir be, tişt nabe. Eş êdî namûs û şerefa me ye. Eger em li bûka xwe xudan bidernekevin, içar em nikarin li vî gundi serbilind bijîn. Ew dê ji me re bibe şermek mezin.

Bavê Eşê, bi neçarî bîryara xisimê xwe qebûl dike û ji malê derdiikeve.

Bextê Eşê, wek ji nûve dihatîye nîvisandin. Lê hay a wê jê tune bûye. Dema ku dibîlhîze, minak agirek dikeve canê wê û dest bi şînê dike. Lê tiştek nadihatîye guhêrin. Wê,

ne bawerî toreyan dikirîye, ne jî, têdigihiştiye bûyerên ku dihatibû qewimî. Lewma heta destpêka sibehê di nav ciyên xwe da girîyaye. Carinan bi xew ve diçûye, carinan jî xiyalêni bi tirs û balkêş diditîye. Hinek caran jî, dest bi gazindan dikirîye û wiha digotîye; “Felek û toreyên we têkevin binê erdê inşala. Hê çelê Îbrêm derneketiye, hê enîya min ya ranemûsandî tev li xwelîyê nebû ye. Ev çito bext, çito tote ye? Brayê Îbrêm çawa têkeve ciyê min û ezê çawa vê yekê qebûl bikim. Xwedêwo! Ev çi şermek mezin e! Mem hê kurikek e, çawa bibe mêtê min!”

Gundê Eşê li dawîya çiyayeki bilind bû. Carinan ji mal a xwe bider-dikeve û diçe li ser zinarekî rûdine. Xwe bi xwe difikire û dixwaze hemî çewtîyan ji jîyana xwe biderxîne û wan sererast bike. Lê nedizanîye çawa, an jî, ji kuderê da destpêbike. Xezûrê wê, malbata xwe wiha teme dikirîye: “Aman Eşê bitenê nehêlin. Bila tiştekî çewt neke.” Ji hêla din ve, miqatîya dayik û hevalên wê jî qet li ser wê kêm nedibûye.

Roja ji Memê re kirine bûk, xwe wek jinek bî û pîrik diditîye. Di dilê xwe da tû dikirîye qedera xwe û toreyên korbawerî. Carekê téra dilê xwe nekenîye. Wê gavê, hevalên xwe şara serî wê ya reş diguhêrinin.

Îcar bi şarek kesk û bi leşikek rengin dixemilînin.

Heft salan rind xirab bi Memê re jîyana xwe domandîye...

Du keçen wan hatine dinê û yet ji yekê rindiktir bûye. Eş, wek bi hebûna wan li ser lingên xwe radiwestîyaye. Lê feleka mal şewitî, dest ji jîyana wê bernedidaye. Ji ber ku, îcar Mem nexweş dikeve û zirav zirav dikuxê. Her roj, wek piçek din jar dikeve. Evara davîyê, tevî kuxika xwe xwîn jî vedirêse. Bi lezekê direvînin û dibin bajêr. Sê rojan di nexweşxanê da dimê. Toxtoran, xwîna wî nedikarîne rawestînin. Li gora vegotin û ceribandina wan: “Nexweşîya Memê jana zirave, û pir dereng mayîye.” Mem, di nexweşxanê de tenê sê rojan dije û bi ser nakeve. Jana xopan dibe sedema mirîna Memê û du sêwîyan jî di hembeza Eşê da dihêle.

Piştî mirîna Memê, Eş wek bi qederâ xwe qehr dike. Carinan bideng, car caran jî bêdeng di dilê xwe de wiha dibêje: “Xwedêwo! Ewqas zulm ji bo çi ye? Min çi kiribû ku felek ji pîstê min nabe. Ez ku da herim, çi xwelîyê bi serê xwe kim. Na, na êdî bese! Ez di bin vî barî giran da, nikarim zêde bijîm. Min qet tu xêr nedît ji jîyana xwe. Êdî hêz û hîleta min nema.”

Gundiyan, li gorîstanê Mem binax dikirin. Jinêni li derûdora Eşê jî,

tevî şînêñ xwe qala bêbextî û pêşeroja wê dikirin. Eş, hemî gotinan dibihîze lê qet bersîv nade tu kesî. Ew bi herdu keçikên xwe re mijûl dibe. Porêñ wan bihn dike û maç dike. Carinan serê xwe dike navbera herdû destêñ xwe û bi wî awayî demekê difikire. Car caran jî, dikeve nav xem û xiyalêñ kûr û wek wenda dibe.

Piştî çendek heftan, xezûrê Eşê bangî wê dike û wiha dibêje; "Binêre keça min! Ew qeder û bêbextî, ne tenê ya te, ya me giştikan e. Car caran mirov li hemberî rewşen wisa nêçar dimîne. Tu hé (hîna) ciwanî. Di nav xelkê de tu bê mîr, neviyêñ min jî bê bav nabin. Ji iro bi şunda, tu êdî jiña lawikê min Selo yi"

Eş, tu bersivan nade xezûrê xwe. Radihêje destêñ herdu keçikên xwe û ji odê derdikeve. Dîsa loma ji qedera xwe dike û dibêje: "Xwedêwo! Tu xudanê erd û ezmanî û divê piçek tu arîkarîya min bikî. Welleh edî tu héza min nema. Li hemberî van bûyerên qirêj, hiş û aqilê min cemidîya. Felek dîsa xayîn derket û ez carek din xapandim. Yan dest biavêje jîyana min, yan jî, ji vira ha edî tu loma ji min neke!..."

Eş, zikê herdu keçikên xwe têr dike û wan dike xewê. Di guhêñ wanana da, wek xatir xwastinekê ev gotinêñ xwe yên dawîyê dike: "Min bibexşînin! Tu halî minî ku ez li ser lingêñ xwe rawestim nema. Bi vî halî, ez ji we re tiştekî nikarim bikim û nikarim bibim dayîkek baş. Min bibexşînin xezalêñ min!" Herdu xwişk ketibûn xewek kûr û şev jî hatîbû navçeya şevê. Ji temaşe û hezkirina keçikên xwe, qet têr nedibû. Yek dihişt, îcar ya din maç dikir û têra dilê xwe bîhn dikir.

Di destpêka sibê da, ji nav nivinêñ xwe biderdikeve. Bi awayekî bêdeng deriyê malê vedike û bi lezekê ber bi çiyayê bilind dimeşe. Hildikişê ser zinareki û bi dengekî bilind wiha diqîre; "Ax feleka xayînê! Qet dilşa nebe û xwe nepesîne. Tore (kevnesop) û neçarîyê ez kirim berdestî te. De bila were vê gavê min rawestîne! Rawestîne ku, em bizanin ka berx kî ye û beran kî ye?" got û xwe ji ser zinêr de berjîr avêt.

Jiyana Eşê, ji dengbêjan re bû stran, di bilûra şivanan da jî bû meqameki hêja û qet nehat jibîrkirin.

Şivan û şiv

Heft çeşid vêşîniya bi şivê

Amedekar: Nuh Ateş

Sivan bê şiv nabe. Ew şivê ne tenê sewa ajotina pêz û xwe parastinê bikar tîne. Ew pê vêşîniya xwe jî heldine. Zûva



Pez şivén ì têr e, kefe şivén li ci ye.
"Şiva min piştaziya min e."

ye ku, min dixwest li ser mijara vêşîniya şivanan a di sayê şivê de çend resiman peyda bikim. Îsal rast hat û bû nesîb. Ez û Ehmedê Memoyî Heso tevehev çûn gundê Germikê (Kulu-Konya). Li wir, li perî gund em raste kurê pismamê Ehmed, Resulê Miloyî Huso hatin. Li ber pezê xwe bû. Me jê ra mirazê xwe got û wî jî qebûl kir û li gora xwaztina me, heft çeşidên vêşnîya bi şiv bi me nimandin û me jî resimê wî helna kamerayê. Aniha wan pêşkêşî xwendevanê Bîrnebûnê dikim.



Şivanî bê şiv nabe.



Şivan, dema sohbetê.



"Şiva min sileha min e."



Şivan ì xweş xwes li pezê xwe dinêre.



"Şiva min hebûna min e."



"Pez ì bi durket, ez divê herim."

Kulîlka çiya

Xopana zivistanê
Her derek xemiland
Mayî di bin Berfê da
Lê ez ne li cem te...
Bawer bike kulîlka min
Ez jî di nav nivinan da cemidîm.

Li ber Rebî gerîyam
Were Bihar!
Were me azad bike...
Çi ye ewqas zulm?
Jî ser me rake
Piçek sivik bike

Paşê dengek peyda bû
Ne xêr!
Wek fermo bû.

Hewla min a bêhêvî
Ax! Kor bibim ez Gulê
Negêhiştîm cîhê te
Çiya û banî lerizîn
Bi bang û qîrîna te.

Disa, dirêjî ezmanan bûm
Lê, tiştek nehat guhêrîn
Piştî çûyîna te.
Çi bikim Kulîlka min?
Nebihîst Rebî,
Nebihîst, hewara min û te

Mam Recall

Hatim ji bîrkirin

Wextekê ez şîrîn bûm
Navê min Recall
Wekî çem û kanî bûm
Ava min zelal

Hêdî hêdî mezin bûm
Wek her zarokan
Berê bihar, payîz hat
Paşê zivistan

Min gelek heval girtin
Ji nav gel û xortan
Li mal mîna bilbilan
Li der bêziman

Paşê eşqek peyda bû
Piştî bîst salan
Ew çi keçek bedew bû
Ala Kurdistan

Êdî ji welat dûr im
Naşêm bifikirim
Wek koçberên nênasîn
Hatim ji bîrkirin.

Mam Recall

DİROKA RÛREŞ Ü EZ

Xizan Şilan

ey cîhana ker û kor
ey dîroka rûreş
ji ber hovîtiya we
çûkêñ asîmanan reş girêdan
stêrkêñ şevêñ sayî
rondikan dibarînin
miriyêñ goristanêñ lal
bi xwe hesiyan
barana demsalêñ kesk
xemgîn dibare
bilbilê dengxwes
di awaza xwe de fetisî
movikêñ pişta êvarêñ mesûm
şikestin
ba û bagerê serî hildan
ji ber hesûdî û hîleyêñ we
dikim hawar û gazî
û ber bi çolistanêñ tenha ve
dibeziñ
ma çîma tu ewqas xêrnexwaz î
ma tu canbaz î
li ser axa min difirî
û bi qedera min dileyizî
li kolanêñ rojavaya dil
parçeyêñ goştê laşê min
nale nal in
ey cîhana bêwijdan
min pir eş
di malzaroka heyaman de
kevn kirin

bibihîzin
qêrîna giyanê zarokên rojê
bibihîzin
feryada keç û xorêtê nav agir
bibihîzin
dengvedena şikeftên zinaran
ez ê
şeweta kezeb û bedena xwe
bi henasa xwe ya germ
vemirînim
ji pêşîrên demê
hêviyên keskesor
bimijîm
li ber dîwarê xeyalên xemkêş
tevna dilovaniyê bihûnim
bi berxwedana şervanan
sirûdêñ serkeftinê
bistrênim
li meydana azadiyê
govenda şadiyê
bigerînim
bêhna çîçekên rengîn
li ser sînga welatê şaristaniyê
belav bikim
û ava jiyanekê bextewar
di navbera sînorêñ qelişî re
biherikînim
hezar silavan
ji giyanê pakrewanêñ xwe re
hezar silavan
ji mîrxasên xwe re
bişînim

2013-08-10

Stockholm

ez

li nav kolan û kuçên
bajêr geriyam
siya min xûya nedikir
dengên pêkên min vedigeriyan
stêrka ku agir li pê
ji ezman da herikî
cavên min li feqan digeriyan
li nav zinaran
darên sêvan gul vekiri bûn
min porê xwe li ber neynikên
gulan şê kir
û
li ser pêlên okyanûsan sıwar bûm
û
derketim ser rê

Seyfi Doğan

*Helbest – werger
Ji kesekî hezkirî ra*

Lara-Sophie Milagro*

wergera ji almanî: Nuh Ates

li yadiya dûr bim ez
ku lê tiştek bi min ne biguman
ku lê bajar bêbaldarî û nêz
ji jur da li min dinihêre
ku lê ez bi cadeyan da diherim biley
û nizanim – ku va herim?
ku lê qet darek naxwaze û dike naz
ku ji min ra bibêhe ez ì giring im...,

ku lê ger rahênim kîtebekê ez
û bixwazim wê bixwînim
xwe venake ji min ra qet yek rêz
peyv dimêñ neliv û ketum
ku lê ez devê xwe vekim eger
sewa ku xwe bidim nasandin
nav, rengdêr, lêker
li ber heldinin...,

ku lê ez herim derekê
bêzar dibe sohbet
û gava xew bi bîra min tê
tiştek dike vingeving bi dengekî huskut
û ku ez dihêm her kingê
Şew zûva radibirt
û ku ez rûnim ferk nake li ku derê
min şas cih digirt
ku lê li nav keriyêk insan

*Lara-Sophie Milagro alman e, li Berlînê hatiye dinyayê û zanyariya artîstiyê û denbêjîyê xwendîye. Di besên şano û filîm da kar kiriye. Min ew bi minesebeta parçeyê şano yê bi navê, „Satoe – Gesegnete Heimat“ yê ku ez jî wekî aktor tê da xwedîyê rolekê me, nas kir. Ji aliyê berhemên nivîskî da jî jineke jîr û jêhatî ye. Ev helbesta wê pir çû xwaşa min, lewma min ew, bi îcazeya wê, wergerande kurdî.

kesek min nas nake
û yê ku nas tê bi min
bi lez xwe badide dihere
ku lê seet ger ez wê bipirsim ka çendin
tim dibê pir dereng e!
ku lê rêya ku ez pêda diherim, wey li min
pêya min red dike

war ew e: hêskirina zimên
ne tenê di wî gihêstin
war ew e: bi rêtêyên nas da
binasîn çûyîn
war ew e: bîranîn
dosyêن min bixwe
rêgeh, xanî, dar, însan
dosyêن min bixwe
war: ew ne sirûd e
ne destê dayî ser dil
ne sond, hevgirtinêن ebedî
sond dixwim berwe ezmên
kerekterê gelê xwe
ne pir nêzikî yekî be
na eger ew pê nas be, berî gîsta
ew ê bihê kivşkirin...,

war ew e: bihêyî naskirin
ku meriv nexwaze jî
war ew e: aîdêbûn
bêdeng yan bi qîrî
war: li wir û li vir û li dera han
dikane li her derê be
û tu li ku derê bibî
cîhwarê min ew e....,

ku war li te bibe yad :
ez ê lêxim û herim li kêleka te.

SOHBETÊN MAMÊ (1)

Mam Recall

Mistefa yê sêyemin

Her çiqas dayîkên me cuda bin jî, ew him xwenga me ya mezin ú him jî wek dayika me ye. Bavê min rehmetî, zewaca xwe ya siftê bi dotmama xwe re kiriye. Ji dotmama bavê min tenê keçikek (xwenga min Havva) dibe. Dema dayika wê digihêje rehma Xwedê, ew hîna di qûndaxê da ú zarokek bûye. Dapîra wê, ew li gundeki tîrkan mezin kiriye. Ji ber wê yekê; ziman, dîtin ú bawerîya wê jî ya me cudatir e.

Sala borî, ez sê caran çûbûm sere-dana xwenga xwê. Di her carekê da, bi awayeki cuda û dilvekiri pêşwazîya min dikir. Li hemberî min runişt û di hundirê çavên min de, ev gotina xwe kiribû:

“Di jiyana min da, tenê sê Mistefa hene. Yê yekemin; Mihemmed Mistefa ye. (û destê xwe dida ser dilê xwe) Yê duyemin; Mistefa Kêmal e.(wek kurdên me yên kemalist, bi awayeki korbawerî qal dikir) Yê sêyemin jî; birayê min Mistefa ye.” (ew bêbexta jî, ez bûm)

Jiyana xwenga min, ne tenê wek çirokek balkêş e. Jiyana wê, ji bo sedema asîmîlasyon û windabûyîna

zarokên kurdan, mînakek gîring û watedar e jî. Û bêguman di pirtûka min da, jiyana wê bi awayeki vekirî dê cih bigire û were nivîsandin.

Li wan hewdudîtinan, me bi zimanê tîrkî qala bûyerên gelek balkêş kiribû. Ev diyalogê li jêr, ji wan yek e:

Xwişkê! Ez baş dizanım ku; tu jinek ezîz û bêguneh î. Eger li hêla din bihuşt (cenet) heye, tu ya bêpirs li wira bi cih û war bibî. Lê ez tiştekî pir meraq dikim. Ez karim bersiva wê meraqê xwe ji te bipirsim?

-Helbet dikarı bipirsî, keremke birayê min.

Di dilê te da sê Mistefa hene, ne wisa?

-Erê, sê Mistefa hene.

Yek ji wan ereb, yek tîrk û yê dawîyê jî kurd e.

-Erê, rast el... (û di ber xwe da dikenîya)

Ya ku ez meraq dikim; em bibêñ tu bêpirs şandin bihuştê. Lê Xwedê neke; ez û Mistefa yên din jî avêtin binîyê cehnimê. Û ji hêla berpirsyarên Xwedê da, nameyek wiha ji te re were û bibêñ:

‘‘Havva Xan

Tu jinek wek melayîket (ferîste) bûyî û lewma Xwedê bi bihuştaya xwe tu xelatkirî. Ji hêla me da baş tê zanîn ku; di dilê te da sê Mistefa yên bi qîmet hene. Ew niha di cîheki xirab da dijîn û hesabê emelê xwe di-din. Em dixwazin ji wan Mistefan, yekî li wira bîhelin û herdu yên din ji bona xatirê te azad bikin. Û bişînin cem te ku; bila li bihuştê bibin heval û ciranên te.

Havva xan, ji bo naveroka vê fermanê baş bifikire û hetanî sibehê biryara xwe ya dawîyê bide me.

Em bi navê Xwedê ezîm û şan; slav û rûmetîyêن xwe pêşkêşî cenabê we dikan.’’

Wê gavê; sûretê xwişka min zû bi zû reng diguhêrand...

Û heneka min, di dilê wê da wek rastîyekê dihatibû nirxandin. Bêguman min baş dizanibû ku, Mî-hemmed Mistefayê bi ser bikeve. Lê hemî xiret û armanca min, ji bo Mistefa Kemal bû. Ez bawer im, wê gavê xwişka min jî wek min difikirî.

Û lewma wek di navbera min û Mistefayê Selanikî da diçû û dihat. Piştî demek qut, bi awayekî bixwe ewle wiha bersiv dayîbû min:

-Xwezî bihuşt bibe qîmetî me û em her çar li cem hevdu bijîn. Û xwezî ez liwir ji we re bibim xizmetkar.

Xwişka min! Ne tenê ez, berpirs-
yarêñ Xwedê jî li benda biryara te ne.
Ji kerema xwe re Mistefayeki bihêle û
navî du Mistefan hilde.

-Ez çawa hildim birayê min! Em
ji bo ci pexamberî Xwedê û rîberî vi
welatî diavêjin cehnimê? Qet tişteki
wusa dikare biqewime? Eger Xwedê
guh bide ser van axaftinê me, wel-
leh ew dê pir aciz bibe. Em qala tişte-
ki din bikin ez qurban!

Xwişka delal! Ez fêrî bersiva pirsê
xwe bûm. Edî eşkere bû ku; ‘‘ez bi
rastî Mistefâ yê sêyemin im’’ û di
binê cehnimê da mam. Bila canê te
saxbe!

Şîretek Mûsewî

L i sala 1987 an, li bajarê Antalyayê di keştiyê da me qehwe vedixwar. Wê rojê, mîvanê min kaleki mûsewî bû. Mijara me li ser rewşa Kurdan û Kurdistanê bû. Mîvîn, berçavk ji çavêñ xwe yên şîn derxist û bi dest-mala xwe ya spî, çav û rûyêñ xwe paqîj kirin.

Paşê, bi zimanê tirkî wiha digot:

“Kürtlerin durumuna acıyor, çok üzülüyorum evlat! Sizleri dört aslanın arasında kalmış, çaresiz ve umutsuz bir ceylana benzetiyorum. Gayret ve çabalalarınız güzel de, lakin bu durumunuz sonucu değiştirmez. Çünkü siz

birbirinizi sevmiyor, birbirinize güvenmiyorsunuz. Bana göre bu yüzden başarılı olamıyorsunuz. Sizleri çetin ve zahmetli günler bekliyor. Ne diyeyim, Tanrı yardımınız olsun!“

Wate ya axaftına mêtvén:

“Ez ji bona rewşa kurdan, pir dilêş û xemgîn im lawo! Ez, we wek xeza-lek di navbera çar şeran da neçar û bêhêvî mayî dibînim. Hewl û xiretên we baş û balkêş in. Lê ew rewş, nikare encamê biguhêrîne. Ji ber ku, hezkirin û bawerîya we bi hevdu re tune ye. Li gora dîtina min, hûn lewma biserna-kevin. Û di pêşeroja we da, jîyanek dij-war û bi zehmet xuya dike. Çi bibêm, bila Xwedê arîkarîya we bike!“

Erê, gotinêñ kalê hemî rast bûn. Lê disa jî, min ji dilda nedixwast qebûl bikim. Lewma şeytanê kor ketibû hundirê min û wiha digot:

“Gelo tu hîn çi disekinî lo, rabe vî kalî himbêz bike û biavêje deryayê, bila ji masiyêñ birçî û xizan re, bibe xwarinek bi taybet.”

Piştî demek qut, merhemeta dilê min bi serket û şeytan jî bi dûrket.

Tevî kuxikek ziha, min wiha ber-siv dayibû kalê:

“Sevgili ağabeyim, tüm söyledikle-rin doğru da lakin kurtler eski kurtler değil. Tanrıya şükürler olsun ki, uyan-dık artık. Bu özgürlük rüzgarının kar-

şısında, hiç bir aslan tutunamaz. Siz yahudiler ki, yüz yıllar sonraecdadınıza ait topraklara geri dönüp ülke kur-dunuz, bizde pekala kurarız. Üstelik biz daha avantajlıyız. Zira halen dağ-larımızda yaşıyoruz. Sizler gibi korku-ya kapılıp yabancılara kaçmadık.”

Wate ya axaftına min:

“Kekê hêja, hemî gotinêñ te rast in. Lê kurd ne kurdê berê ne. Sipas bo Xwedê, em jî êdî hişyar bûn. Li hemberî vî bahozî azadîyê, qet tu şer nikarin rawestin. Hûn yahûdiyêñ ku, piştî sedan salan vege riyan ser axa bav û kalêñ xwe û we welatê xwe ava kir, em jî dikarin ava bikin. Bi serde hîna li çiyayêñ xwe dijîn. Em wek we, ji ber tirsê nerevîyan welatêñ bîyanî.”

Mêvanê min, bi rûmetek herî me-zin guhdarî li min dikir. Paşê, di navbera min û mêtvén da bêdengiyek qewimî. Wek li hemberî min qet tukes tune bû. Wek ez bi tena serê xwe, di hundirê deryayê da winda bûm. Wê gavê, hemî hêviyêñ min bûbûn wek kevokêñ spî û yet bi yet ji dilê min derdiketin û berbi esman difirîyan. Û ez jî bûbûm, temaşevanê hêviyêñ xwe yên bêhêvî.

Paşê, dîtinek balkêş bala min di-kişand...

Gelo, esman û derya ewqas nêziki hevdû xuya dikirin ku, wek Mem û Zîn ji nûve gihaştibûn hevdû.

Ez bi dengê mîvên hişyar bûm.

Gelo, mirovekî çiqas ters e lo?

Nehêst, ez têra dilê xwe, temâseyî hevdudîtina Memê û Zînê bîkim. Şeytanê nalet, disa li derûdora min boçik badikir û peyvên xwe yên berê dubare dikirin.

Mêvanê min, wiha berdewamî axaftina xwe dikir û digot:

"Bak evlat! Bizim anlayış ve geleneklerimize göre; kişi ''ben museviyim'' dedikten sonra başka soru sormayız. Artık o kişinin insanımız olduğunu bilir, kendisini baştacı ederiz. Lakin siz kurtler böyle değilsiniz. Her şeyi ince ince sorar, ona göre değerlendirip, karar verirsiniz.

Örneğin:

Adın nedir?

Nerelisin?

Hangi köy, hangi aşirettenin?

Nereden geliyor, ne iş yapıyorsun?

Sunni mi, alevi misin?

Buna benzer aslı astarı olmayan onlarca soru sorar, kişiye aşiret, ya da, dinine göre kıymet verirsiniz. Bunları terkedin ve birbirinizi sevin evlat. Ne zaman birbirinizi severseniz, o zaman istediklerinizin hepsini elde edebilirsiniz. Yoksa, daha evvel dediğim gibi durumunuz hiç hoş gözükmüyor. Ha, seni de çok sevdim evlat. Bir kaç saat tir izliyorum. İnsanlara zevkle hizmet ediyorsun. Kaptanlığını da çok beğen-

yorum. Kahven ve sohbetin için teşekkürler!"

Wate ya axaftina mîvên:

"Binêre lawo! Li gora têgihaştin û kevneşopiyê me, eger kesek bibê ''ez mûsewî me'' êdî em nikarin pirsek din ji wî kesî dipirsin. Em dê bizanin ku ew kesa gelê me ye. Û em dê wî kesî bikin taca serê xwe. Lê hûn kurd ne wisa ne. Her tişteki hûrik hûrik dipirsin û li gora wê dinirxînin û biryara xwe didin.

Wek mînak:

Navê te çiye?

Tu ji kuderê yî?

Ji kîjan gund, ji kîjan eşîrê yî?

Ji kuderê têyî, ci katî diki?

Sûnnî, an elewî yî?

Pirsên wiha yên wek bêbinyat dipirsin û li gora eşîr û dînê wî kesî rûmetê didin. Êdî vana bihêlin û ji hevdû hezbikin lawo. We kîngê ji hevdû hezkir, hûn hîngê dikarin xwastinê xwe bidest xwe bixinin. Yan jî, wek min berê jî gotibû rewsa we qet baş xuya nake. Ha, min ji te jî pir hezkir lawo. Çend seet in ez temâseyî te dikim. Tu ji dilda xizmetî mirovan dikî. Bi qaptanîya te jî pir qayil bûm. Ji bo qehwe û axaftina te jî gelek sipas!"

Mêvanê min, hêdî hêdî rabû serxwe, çû li bin sîwanê rûniş û dest bi pirtûk xwendinê kir.

Min jî, li Mem û Zînê temaşe dikir...

Gelê Kurd bi dol, zirne û defen xwe, pêşwaziya Memê û Zînê dikirin. Xelekên govendê ewqas zû pêkhatibûn ku, mirov nedikarîbû wan xelekanbihêjmarîne. Kurdan, di destê şêhîd û mezinê xwe da bi govend kışandinê, wek wateya wê rojê pîroz dikirin. Rewş û dîmena rêxistinê baş û balkêş xuya dikir. Tililiya delalan wek ewr didirandin. Ji ber sedem û tesîra dengê wan, him kevok vedigerîyan û him jî, ji esman pel dîbarîyan.

Erê, wê gavê wek ji hêla Xudêda pel dîbarîyan...

Pelên gulan...

Gulên kesk, gulên sor û zer...

Hêdî hêdî dihatibûn xwarê...

Ü yek bi yek dadiniştin ser milên Zînê, Leyla, Bêrîvan û Bêrîtan...

Şal û şepik, xeftan û fistanêñ gelê min, bi pelê gulên rengîn dihatibûn xemilandin.

Ü kevokên spî, ji dilê min merhemet pars dikir û lêborîn dixwastin.

Bi firîn û lîstikêñ xwe, wek poşmanbûyîna xwe dianîbûn zimên.

Ü ji nûve carek din dikerin dilê min..

Îcar bênavber, daîm û ebedî!

Moşengêrê me (Makînevan) Hemdi, li bogira min rawestîya û wiha digot:

“*Hayirdır, ne oldu Kaptan? Deniz aynı deniz, orman aynı orman be birader! Yani her şey her günde gibi yerinde duruyor. Kaç saatir aynı manzaralara boş boş bakıp duruyorsun. Haydi kendine gel, gitmek için yolcular da, biz de hazırız.*”

Wate:

Xêr e, ci qewimî qaptan? Gelo derya heman derya, daristan heman daristan e. Anglo her tiştek wek her roj di şûna xwe da ye. Çend seet in tu temaşeyî heman dîmenan diki. Divê tu êdî hisyar bibî. Ji bo çûyînê em jî, rîwî jî amede ne.

Bi dengê Hemdî, hemî xiyalên min hatîbûn hilweşandin. Ji hêlekê da kalê müsewî, ji hêla din moşengêr Hemdî û ji alîyê din ve, şeytanê kor. Ü bi neçarî dirêjî Xwedê bûbûm.

Rebiyê min! Sebrek mezin keremke. Van her sê jîndarêñ te, roja min tarûmar kirin. Yan min ji van bi dûrbixîne, yan ji biparêze!

Edî em vedigerîyan Antalyayê...

Min him karê xwe dikir û him jî temaşeyî mêvanan. Wê gavê, şîretvanê min ji neviya xwe hezdikir. Min jî, di aqilê xwe da şireten wî dubare dikirin.

“*Êdî vana bihêlin û ji hevdû hezbikin lawo! We kîngê ji hevdû hezkir, hûn hîngê dikarin hemî daxwazên xwe bidest xwe bixînin.*”

Mînakêن yekemîn çîrokêن zarokan ên bi kurdî hatine nivîsandin û lêkolîna wan a ji aliyê naverok û şêweyê ve

Meral Solmaz
Werger: Yasin Duman

Kurtebir

Armanca vê xebatê ev e ku mînakêن yekemîn çîrokêن zarokan ên ku bi kurdî hatine nivîsandin, lêcole û diyar bike ka, li gorî pirtûkêن zarokan, asta têrkeriya wan a şêweyî û naverokî, di kîjan radeyê de ye. Di vî warî de, şes heb pirtûkêن zarokan ên bi kurdî ji aliyê taybetiyêن nave-
rok û şêweyê ve hatine lêkolîn û nir-
xandina wan a naverokê hatiye kirin.
Di encama lêkolînê de hat tespitkirin
ku ev pirtûk ji aliyê resimandin û
şêweyê ve qels dimînin, hinek ji wan
ne perwerdekar in û hewl didin fîkrêñ
îdeolojîk hîn bikin. Lê dîsa jî, hinek
ji wan perwerdekar in, li gorî zaro-
kan in û hêmanêñ çandî dihewînin.

Peyvîn lêkolînê:

- wêjeya zarokan a bi kurdî,
- çîroka zarokan a bi kurdî,
- taybetiyêن şêweyî,
- taybetiyêن naverokî.

Destpêk

Saziyen têkildarî perwerdehiya bi zimanê kurdî diviya ji damezirandina Tirkiyeyê heta niha hebûya lê ev yek di salêñ dawî de pêk hat û ketin faliyetê. Her çiqas qadêñ xebatê ên saziyen bi vî rengî yêñ ku di bin zanîngehan de cih digirin, hîna têrê neke jî ev rewş li Tirkiyeyê rê li ber xebatêñ akademîk ên têkildarî zimanê kurdî vekiriye. Tê gotin ku hejmarêñ wan zanîngehan dê zêdetir bibe. Di hinek ji wan de di beşen Ziman û Wêjeya Kurdî de li ser kurdî tez hatine nivîsandin û xebatêñ cur bi cur bi awayekî akademîk hatine meşandin. Her çiqas di wan xebatan de li ser wêjeya zarokan a bi kurdî tiştek nehatibe kirin jî di programa lîsansa bilind a Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê de, dersa “Wêjeya Zarokan a bi Kurdî” tê dayin. Bi vê yekê, ji bo wêjeya zarokan a bi kurdî, qadeke akademîk vebûye û di vî warî de derfetek çêbûye ji bo gihandi-

na nivîskarên nû yên ku dê bikaribin pirtûkên hemdem ên zarokan binivîsin.

Wêjeya zarokan a bi kurdî, ji bo gihandin û danasîna wêjeyanê kurd ên di pêşerojê de dê deng vedin, qadeke girîng e û divê bê bipêşxistin. Güler (1992) dibêje ku eger iro berhemeke wêjeya tîrkan bi nav û deng nebûye di cihanê de, sedema vê ev e ku wêjeya zarokan qels maye. Heman rewş ji bo hemû zimanan derbas dibe. İro li ber pêşdeçûna wêjeya zarokan a bi kurdî, pirsgirêkên gelek dijwartir hene. Wek mînak, zimanê kurdî hîna jî di dibistanan de wek zimanê perwerdehiyê de nayê bikaranîn. Qanûna bingehîn a 1982'yan bi xala 42an vê derfetê asteng dike. Di sala 1995'an de, Tîrkiyeyê îmze avêtiye bin Muqaweleya Mafêن Zarokan a Neteweyêن Yekbûyî, lê belê îhtiraza xwe nişanî xalên 17, 29 û 30an ên derbatê perwerdehî, çand û zimanê dayikê de ne, daye.

Zimanê kurdî bi salan bi zext û qedexeyan re rû bi rû maye. Lê dîsa jî li ber xwe daye û hebûna xwe berdewam kiriye. Li Tîrkiyeyê, ji bo vê jî saziyên wek Enstituya Kurdi, komle û şaredariyên herêmî xebatêni bi zimanê kurdî çap kirine. Di salêndawî de, hejmara pirtûkên zarokan ên ji aliyê weşanxaneyên taybet ve

tên çapkîrin, her diçe zêdetir dibe. Armanca vê nivîsê ev e ku naveroka mînakêni yekem ên çîrokêni zarokan derxîne holê û bo pêşdexistina wesfîn pirtûkên zarokan, ji weşanger û nivîskaran re pêşniyaran bike û agahîyan pêşkêş bike.

Lêgerîna literaturê

Ji bo ku têgeha 'wêjeya zarokan' baştir bê famkirin, divê em terîfa zarokê bikin. Zarok, kesen keç an jî law ên temenê wan di navbera serderma pitikî û kamiliyê de ne (Yalçın û Aktaş, 2008). Her çiqas nîqaşen 'gelo wêjeya zarokan mileke cûda ya wêjeyê ye?' berdewam dike jî, iro wêjeya zarokan wek qadeke cuda xwe bi pêş de dibe. Li gorî Severê (2008) "Wêjeya zarokan, di merhaleya dema pêşin a zarokatiyê de dest pê dike û heta kamîlbûnê dewam dike û wek berhemên ku li gorî asta geşedana ziman û têgîhiştina zarokan, bi hêmanêni zimanî û ditbarî yên xwedîyê wesfeke hunerî ne, cihana wan a hestî û ramani dewlementir dikin, tén binavkirin" (r. 17).

Bingeha sedemên ku têgeha wêjeya zarokan derxistine holê, ne ew qas kevn e. Ji bo peydabûna wêjeya zarokan, em dikarin du sedeman destnîşan bikin: peydabûna çapsaziyê (metbeayê) û xebatêni li ser

pedagojiyê (Çilgin, 2007). Wêjeya zarokan, bi qebûlkirina cudahiya di navbera rastiya zarokan û nêrîna wan a li ser cîhanê û rastiya mezinan û nêrîna wan a li ser cîhanê, derketiye holê (Dilidüzungün, 2012).

Ger geşedana wêjeya zarokan bê lêkolîn, dê bê dîtin ku li hemû derên cîhanê ev pêvajo bi rengekî nêzî hev derketine holê. Her çiqas iro agahiyêñ derbarê zarokan de kêm bin ji, mezin bi awayekî cuda xîtabî zarokan kirine. Lorik, çîrok û berhemên din ên wêjeya devkî berhemên yekem in ku xîtabî zarokan dîkin. Bi belavbûna çapsaziyê hejmara pirtûkan zêde bûye, berhemên wêjeya devkî hatîne berhevkirin û çapkîrin, û zarok ji nav pirtûkêñ ku mezin dixwînin, pirtûkêñ ji bo wan guncav in, bijartîne. Di destpêka sedsala 20an de, têgeha wêjeya zarokan wek şewaza vegotinê û hestiyariya zarokan hatîye bikaranîn (Şimşek, Arslan, Yakkar, 2012). Bi pêkhatinêñ di jiyana civakî û aborî de, fikra ‘divê hemû zextêñ li ser zarokan bêñ rakirîn’ derket holê û her wiha bi pirtûkêñ ku bi bandora tevgerêñ xwendekaran ên piştî 1968’ê hatibûn nivîsandin, destnîşan dikir ku zarok xwedîyê azadiyê ne (Dilidüzungün, 2012).

Geşedana wêjeya zarokan a li Tirkîyeyê, dişibe ya mînakên din ên cîhanê. Di destpêkê de, xwe bi berhemên devkî bi rê biriye. Lêbelê, di salêñ dawî de berhemên xwedî wesf derxistiye pêş me. Gülyüz diyar dike ku wêjeya zarokan di dema tazmînatê de, bi wergerêñ ji rojavayê dest pê kiriye. Piştî ku sala 1979, wek sala navnetewî ya zarokan hat qebulkirin, hejmara xebat û wesanêñ li ser zarok û wêjeya wan zêde bû (Oğuzkan, 2006).

Ji bo wêjeya zarokan, têgeha ‘li gorî zarokan’ xaleke pir girîng e. Hestiyariya zarokî ev e ku kesek bikaribe cîhanê bi çavêñ zarokan bibîne, bi têgihiştina wan fêm bike û şirove bike (Akşehirli, 2011). Ji bo ku fîkrîn xwe empoze bikin, mezin her demê pirtûkêñ zarokan wekî navgînekê bi kar anîne. Gürel (1992) diyar dike ku ji ber ku dewlet teşe didê, divê geşedana zarokan a di gelek waran de, bi pergala dewletê bê analîzkirin. Iro li seranserê cîhanê, pirtûkêñ zarok û mezinan li gorî daxwaza civakê digihînin û di weşangeriyê de rola qezenza bazırganiyê dîlîzin (Çilgin, 2007).

Beriya ku em çav li geşedana wêjeya zarokan a bi kurdî bigerînin, hewce ye em li rewşa wêjeya kurdî binêrin. Li gorî Uzun (2007), ji ber şertîn tê de wêjeya kurdî di sînorêñ

windabûnê de ye û bi taybetî ji ji salên beriya sedsala 20’emîn heta parçebûna Kurdistanê piştî nivîskarêن hêja gihiştin, di encama polîtikayê dewletê yên zordest, qedexekar û tûneker, em nikarin neheqiyê bikin û wêjeya kurdî -ku nebûye xwediyê dewletan, saziyan an ji enstituyan- bi wêjeya welatêن din bidin ber hev. Xebatêن li ser kurdîyê, piştî avabûna Komara Tirkiyeyê li rastî gelek asten- gîyan hatine, lê dîsa ji heta Cûntaya 1980’yan dewam kirine, ji 1980’an heta 1990’an xebat li Ewropayê me- şiyane, bi berxwedana gel a girseyî qedexeyêن li ser kurdî rabûne û ev xebat hatine weşandin; Navenda Çanda Mezopotamyayê, Kürt-Kav, Enstituya Kurdî hatine avakirin û xebatêن girîng ên derbarê zimanê kurdî û perwerdehiyê de hatine me- şandin (Tan, 2012). Di salên dawî de, xebatêن têkildarî zimanê kurdî zêdetir bûne. Di Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê û hin zanîneghêن din de, di beşen Kurdolojiyê de, ji bo zimanê kurdî qadeke akademîk vebûye. Di van xebatan de, helbet rola weşanxaneyêن ku pirtûkêن bi kurdî çap dikan, mezin e.

Dema em li wêjeya zarokan a bi kurdî dinérin, em dibînin ku xebatêن di vî warî de, wek li her derê cihanê,

sûdê ji wêjeya devkî digire. Zinar (2011) di vî warî de wiha dibêje: “Di lêkolîna xwe ya ku 12 sal dewam ki- riye de , ez gihiştim 1.710 berhemên folklorîk. Piraniya wan, di berhema min a bi navê Xwençeyê de hatin weşandin. Ji wan 370 heb, çîrok in. ji sedan zêdetir fabl in û piraniya wan ji ji bo zarokan hati- ne nivîsandin” (r.61). Xebatêن li ser wêjeya kurdî çiqas zêdetir bin, dê ew qas berhem derkevin holê. Agahiyêن me yên derbarê wêjeya kurdî de, hîna ji sînordar in. Wêjeya kurdî ne tenê wêjeya kurdêن li Tirkiyeyê ye. Ya kurdêن li Iraq, Sûriye, Îran û hemû kurdêن li çar aliyêن cîhanê ye. Zehmet e ku em xebatêن wisa bikin ku bi awayekî fireh li wêjeya kurdî binêrin. Pertev (2011) diyar dike ku ferhenga kurdî-erebî ya “Nûbihara Biçûkan” (1863) a Ehmedê Xanî, ku bi awayekî pedagojîk û dîdaktîk hati- ye nivîsandin, û ferhenga kurdî-farisî ya “Mîrsad-ûl Etfal” (1912) a Mihe- med Kerbelayê Axtepî, ku bi awayekî manzum hatiye nivîsandin, di wêjeya zarokan a bi kurdî berhemên herî girîng in. Yıldırım (2008) diyar dike ku Nûbihara Biçûkan a Ehmedê Xanî, li gorî rîbazêن hînbûne hatiye nivîsandin û bi salan di medreseyêن kurdan de wek pirtûka dersê hatiye

xwendin û her wiha ferhenga yekem a dîdaktîk e ji bo perwerhediya zimanê kurdî. Ev berhem di sedsala 17an de derketiye ku vê demê hê zarok wekî zindiyekê cuda nedihat hesibandin. Bo vê yekê, em dikarin bibêjin ku hebûna ferhengeke pedagojîk û dîdaktîk, di nav ên welat û zimanên din de girîngiya wêjeya zarokan a bi kurdî nîşan dide.

Heke em li rewşa îroyîn a wêjeya zarokan a bi kurdî binêrin, em ê bibînin ku sedemên li ber pêşdeçûn û domandina wêjeya kurdî, di heman demê de sedemên berastengbûna xebatêni ser wêjeya vî zimanî ne. Özmen (2010) diyar dike ku APEC, saziya yekem e ku bi weşanên kurdî yên ji bo zarokan, li Stockholmê nêzî 20 sal in xebatêni xwe bi îstikrar didormînin. Helwestêni zordes û qedexeker ên li ser zimanê kurdî yên piştî Komariyê, mecbur hiştiye ku xebatêni têkildarî zimanê kurdî li Ewropayê bêni meşandin. Xebatêni ser weşanên wêjeya zarokan ên niyîskarêni kurd ên li Swêdê cihekî girîng digirin. Li Tirkîyeyê, xebatêni bi vî rengî zêdetir ji aliyê komele û saziyên ku bi hînkirina zimanê kurdî mijûl dîbin ve hatine amadekirin. Di salêni dawî de, weşanxaneyêni taybet ên ku weşanên bi kurdî diweşînin, rî li ber weşandina pirtûkêni

zarokan ji vekirine. Li gorî Mîran Janbar, ê ku editörê pirtûkêni zarokan ên Weşanêni Lîsê ye, (2010) zarokêni kurd travma û boraneke civakî dijin, şer û şidet ruhê zarokan ji holê radikin û Janbar (2010) diyar dike ku niyîskariya pirtûkêni zarokan bi pêş de naçe, xebatêni akademîk nayêni kîrin, weşanêni zarokan bi pirsgirêkêni mezinan û xeletiyêni teknikî tije ne û ji pedagojiyê dûr in. ◇

Di weşanêni zarokan de, hin hêmanêni bingehîn hene. Oğuzkan (2006) diyar dike ku hêmanêni wek kîrhatîbûna pirtûkêni zarokan, taybetiyêni saxlemtî û baldariyê, naveroka ku qîmeta hunerî, perwerdehî û hîndariyê ya pirtûkan diyar dike, di encama lêkolîn û sepanêni berbelav de hatine peydakirin û divê pirtûkêni zarokan li gorî wan taybetiyan bêni amadekirin. Taybetiyêni şêweyî û naverokî yên ku divê di pirtûkêni zarokan de hebin, ji çavkaniyêni Oğuzkan(2006), Sever (2008, 2013), Gülleryüz (2003), Yalçın ve Aytaş(2008), Cıvaroğlu (2000), Şimşek (2012), Çılgin(2007) hatine berhevkirin.

Taybetiyen şêweyî

Mezinahî (Ebadêni Pirtûkan):

Zarok hê di temeneke biçûk de, ji pirtûkêni bi ebadêni cuda hez dikin lê

belê ji bo ku di dema dibistana seretayî de hînî avakirina pirtûkxaneyekê bibin, zêdetir pirtûkên bi heman ebadan tê tercîhkîrin. Pirtûkên 16x23 cm wek ebadê normal têq qebûlkirin. Pirtûkên zarokan divê ne ew qas mezin û giran bibin ku zarok bikaribin bi kar bînin.

Cureyê Kaxizê:

Kaxiza pirtûkên zarokan divê wisa bin ku zû neçire, qahîm û biqalîte be û çavên xwendevanan neêşine.

Sazûmana rûpelê (Mîzanpaj):

Divê ahengek di navbera resm, wêne, nivîs, hejmar û hwd. de hebe. Ji bo xwendekarêن dibistana seretayî divê paragraf kurt bin û valahiyeke guncaw li aliyêن rûpelan hebe.

Tîp (Herf):

Ji bo rehetiya xwendîna pirtûkan, puntoyêن herfan (mezinahiya herfan) gelekî girîng in. Em dikarin ji bo zarokêن hê dest bi dibistana pêşîn nekirine 20-24 punto, yên di pola 1, 2, û 3an de ne, 12 punto û yên di pola 4 û 5' emîn de ne jî, 10 punto bi kar bînin.

Rastnivîs:

Pêşîya ku pirtûkan bişînin çapxaneyan, redaktorêن pirtûkan divê xeba-

teke fitoz (tîtîz) bikin. Ji bo ku kesek bi xeletî hîn nebe, divê xeletiyêن nivîsandinê werin sererastkirin.

Resm:

Zarokêن ku hê nivîsê nas nakin, zêdetir bi resmêن di pirtûkan de tiştinan hîn dibin. Piştî naskirina nivîsê jî, divê wênesaz li gorî rastiya zarokan û bi awayekî resen, wêneyêن têkildarî nivîsê xêz bike. Divê resmêن xemlinér, ên ku nivîsê rave û temam dikin bi teknîkeke baş di pirtûkan bêñ bicihkirin.

Berg û qapax:

Hêmana yekem a ku bala zarokan dikişîne, qapaxa pirtûkan e. Qapax divê têkildarî naveroka pirtûkê be û li gorî têgihiştina zarokan be. Divê berga pirtûkan saxlem be da ku di demeke kurt de belawela nebe. Ji bo zarokêن ku dixwazin pirtûkxaneya xwe ava bikin, divê li ser pişta pirtûkan jî agahiyêن derbarê pirtûkan de hebin

Nasnameya (Kunyeya) Pirtûkê:

Divê navê pirtûk û nivîskara/nivîskarê wê, navê weşanxaneya ku ev pirtûk weşandiye di pirtûkê de hebe. Her wiha divê derbarê nivîskar û kesen ku alîkarî dane amadekirina pirtûkê û numareya wê ya ISBNê jî di pirtûkê de bê dayîn.

Taybetiyêñ naverokî:

Mijar: Divê di navbera taybetiyêñ gesêdan û pêdiwiyêñ zarokan û mijarê de ahengek hebe. Mijarê razbêr ên ku zarok dê nekaribin tê bigihijin û şirove bikin, divê di pirtûkê wan de cih negirin. Awayê ku nivîskar mijarê vedibêje, divê bibe bersiva pêdiwiya zarokan a sêwirandin, fikirin û kêfxweşiyê. Divê di navbera zimanê vegotinê û naveroka pirtûkê û mijarê de ahengek hebe. Divê hesta meraqê, bi nakokiyêñ ku li gorî rastiya zarokan in, di asteke bilind de bê girtin.

Tema:

Temayêñ ku bi mijaran ve derdi-kevin holê, divê zelal bin da ku bêñ fêmkirin. Telqînêñ dîdaktik ên rasterast ji zarokan re, têñ kirin, di pirtûkêñ zarokan de zêde nayêñ xwestin. Pirtûkêñ zarokan divê nebin amûrêñ tu îdeolojiyan. Zarok dikarin nirxêñ xwe bi têgihiştina xwe ava bike, divê hînkirina nirxan bi vê riyê çêbe.

Leheng (Karakter):

Zarok xwe bi lehengê/lehenga sereke yê/ya pirtûkê re dikin yek. Lehengê çîrokan divê rastiya mirovan bidin hîskirin. Divê zarok fêm bikin ku guherînêñ di jiyana lehengê/lehengî de, di encama têkiliya wê/wî ya bi

bûyerên jiyayî û derdorê de pêk hâtine. Lehengêñ ku diguherin, zêdetir bala zarokan dikişînin. Hejmara lehengêñ di berheman de divê li gorî temenê zarokan bêñ diyarkirin.

Ziman û vegotin:

Zimanê vegotinê yê pirtûkêñ zarokan, jî bo pêkhatina hişmendî û hestiyariya ziman, hînbûna çanda xwendinê û gesedana bikêriyê roleke pir girîng dilize. Divê ziman li gorî cihana zarokan a têgihiştin û ziman be. Ev yek di heman demê de, bi serdema gesedana zarokan ve jî girêdayî ye. Vegotin divê safî, zelal û herikbar be. Dirêjiya hevok û paragrafan û hejmara wan divê li gorî temenê zarokan bêñ eyarkirin. Divê argo û mecaz neyêñ bikaranîn.

Fikra bingehîn (peyam):

Hesta esas adi pirtûkan de, tê xwestin ku bi zarokan re bê parvekirin, raman e. Di pirtûkêñ zarokan de, hest û ramanêñ cîhana zarokan divê di zarokan de hestiyariya jiyan û mirovahiyê pêk bînin.

Derdor:

Têkiliya lehengan a bi derdora civakî û çandî te divê alîkariya zarokan bike ku zarok têkiliya di navbera wêje û jiyanê de tê bigihije.

Rêbaz

Ji bo komkirin, lêkolîn û şirovekirina daneyê, rêuza lêkolînê ya wesfi hatiye bikaranîn. Pirtûkên çirokan ên ji bo zarokan bi kurdî hatine nivîsandin qada lêkolînê ye. Pirtûk ji weşanxaneyan û *Pirtûkxaneyâ Zarokan a Astrid Lindgren* hatine temînkirin. Ji bo ku lêkolîn bigihêje armanca xwe, pirtûk hem ji aliyê taybetiyêna naverekê hem jî ji aliyê taybetiyêne şeweyê ve hatine lêkolîn û nirxandin.

Encam û Şîrove

Ji bo ku bê lêkolîn, şes heb pirtûkên bi kurdî yên çirokan ên ji bo zarokan hatin peydekirin. Ev pirtûk mînakên yekem ên çirokêne zarokan in ku di wêjeya kurdî ya zarokan de hatine nivîsandin. Li jêr, li gorî sala çapê hatine rêzkirin:

Rûşen, X.(2004). *Teyrê Xerîb*. Resimandin: Tekîn Firat. Weşanên Nubihar: Stenbol (Çapa yekem).

Janbar, M.(2006). *Azad*. Resimandin: Mahmûd Tekîn. Weşanên Lîs: Amed (Çapa yekem).

Bihar, B.(2008). *Sara*. Resimandin: Raof Xetîbî. Avagon: Stenbol (Çapa yekem).

Dîndar, Î.(2011). *Palûte*. Resimandin: Şahîn Tûnç. Wêşanên Evrensel: Stenbol (Çapa yekem).

Tilermenî, Y.(2012). *Kermêşa*

Gerok. Resimandin: Elişér Avcı.

Weşanên Zîbeq: Mêrdîn (Çapa yekem).

Bihar, B.(2013). *Şemar û Solêñ Rengîn*. Resimandin: Murat Yâpicî. Weşanên Ava: Enqere (Çapa yekem).

XURŞÎD RÛŞEN - TEYRÊ XERÎB

Di pirtûka *Teyrê Xerîb* de, serpêhatiyêna zarokê bi navê Birahîm ê ku diçe nêçîra çûkan, tê vegotin.

Mihemedê Dirêj ji Birahîm te dafikek çekiriye. Ji ber ku ev dafik biçûk e, her carî herî zêde pênc an jî şes çûkan digire. Ev demeke dirêj e ku Birahîm bi vî karî mijûl dibe û jî ber vê yekê di warê nêçîriyê de bûye zana. Birahîm rojekê çûkeke mezin dibîne ku wî ev çûk beriya niha qet nedîtibû. Ev çûka mezin dikeve dafikê lê dafikê jî bi xwe re dibe û difire. Bi vê yekê, hem çûk hem jî dafik ji destê Birahîm diçin.

Pirtûk derbarê nêçîr û dafika çûkan de agahiyan dide lê ji ber ku pesnê nêçîra çûkan dide, ne pirtûkeke perwerdekar e. Ji ber vê yekê jî ne pirtûkeke wisa ye ku zarok bixwînin. Lehengê çirokê, Birahîm, hemû dema xwe bi nêçîra çûkan derbas dike jî ber vê yekê ji mirovan dûr ketiye û her çiqas laşê wî ji ger-mahiya rojê aciz bibe jî ev derdikeye

nêçîra çûkan. Birahîm ne lehengekî wisa ye ku zarok xwe pê re bikin yek.

Resimandina pirtûkê ne baş e. Nivisên ku bi resman re li ser heman rûpelê ne, ne têkildarî hev in. Resm bêring in û ne balkêş in. Kaxiza rûpelên pirtûkê bêqalîte ye. Ferhenga ku di dawiya pirtûkê de hatîye nivîsandin, mînak e bo pirtûkên zarokan. Bi ferhengê bi vî tengî, zarok dê çîrokan baştıf fêm bikin û hînî zêdetir peyvan bibin.

MİRAN JANBAR – AZAD

Di pirtûka *Azad* de, çîroka zarokê bi navê Azad ê ku bi pîra xwe re dijî, tê vegotin. Gundê Azad, gundekî tîpîk ê rojhilatê ye. Ji ber ku ev gund nêzî avê ye, li gorî gundêñ din şîntit e. Azad bavê xwe qet nedîtiye. Diya wî, di rojekê bi berf û bahoz de, hê wextê Azad bebik bûye, ew biriye nexweşxaneyê lê careke din venegeriyaye. Elî beriya ku biqerise ew peyda kiriye û aniye gund. Elî her roj, çîrokên xweş vedibêje zarokan, gelek caran jî şekir û benîstan dide wan. Elî rojekê nayê. Azad û pîra wî li Elî digerin û di riya vegekerê de, Elî bi awayekî brîndar peyda dikin. Dema pîra Azad diçe gund ku alîkarî bixwaze, Elî çêlika xezalê ji çenteyê xwe derdixe, dide Azad û jê dixwaze ku ji şikeftê derkeve. Elî ji bo ku vê

xezalê û dayika vê xilas bike ji destê gur, bi guran re şer kiriye û birîndar bûye. Her çiqas Azad gotina Elî kiriye û ji şikeftê dûr ketiye jî, piştre vege riyaye lê Elî li wir peyda nekiriye. Pişti vê rojê, derbarê Elî de careke din agahî nehatîye stendin. Azad xezalê digire û teví pîra xwe û gundiyyêñ ku bi pîre re hatibûn, vedigere gund. Azad, pîra wê û xezal bi hev re bi kîfxweşî dijîn.

Azad çîrokeke wisa ye ku mijara xwe ji dostaniya bi ajalan re, hezkirina mirovan distîne û dikare bikeve cîhana zarokan. Çîrokê, kesê/kesa sêyem vedibêje û bi çavê zarokan listik, jiyana gund û hezkirina ajalan, bi awayekî serkeftî hatine vegotin. Azadî jî xezalê jî dayika xwe winda kirine û ev yek ji aliyê hîsi ve tesîra xwe li zarokan dike. Zimanê pirtûkê zelal e û tê famkirin. Diyalogên di pirtûkê de, vegotinê zindî dike. Di pirtûkê de, lehengê bi navê Eli, peyamekê dide zarokan: ci dibe bila bibe, divê ajal bêñ parastin. Ev yek peyama perwedeyî ya pirtûkê ye.

Pirtûk bi ebadêñ xwe ne pirtûkeke mezin ne jî biçûk e û qalîteya çapê jî ne xirab e. Resimandin baş nebe jî nivîs û resmîn pirtûkê li hev digirin. Bi resimandineke baştıf, ev pirtûk dê zêdetir bala zarokan bikişîne.

BERÎ BIHAR - SARA

Sara, yekemîn pirtûka çîrokan a nivîskar e ku bo zarokan nivîsiye. Di vê pirtûkê de pênc heb çîrok hene. Navê çîroka yekem *Kerê Şîno* ye. Sara naxwaze kesek li kerê wê Şîno siwar bibe. Dayika wê, Sara û hevalên wê, Nebîr û Nefelê, bi Sara re dişîne ku zebeş û gindoran binin. Piştî ku zebeş û gindoran kom dikan, dikevin rê lê Nebîr westiyaye û li Şîno siwar dibe. Sara ji bi awayekî hêrsoyî, Nebîrê ji kerê peya dike. Piştî ku vedigere malê, Sara her tiştî ji diya xwe re vedibêje û Nebîr ji piştre tê û xetaya xwe fêm dike. Bi Sara re li hev aş dibin û vê şevê bi hev re li ser banî li stérkan dinêrin û radikevin.

Di çîroka bi navê *Hirça Regsê* de, Sara û hevala wê Xoşan, çêlika hirçekê, ku di destê mirovekî xirab de gitî ye û ev mirov li ser saca sorbûyi, bi dengê defê listikan dide listin û pê pere qezenc dike, rizgar dikan. Sara û Xoşan, parceyeke pizotê dixin nav solên wî mirovî û tola hirçê distînin. Çêlika hirçê di nav daristanekê de veşartine. Hirç piştre malbata xwe peyda dike û bi malbata xwe re, ji bo ku spas bikin, têr ber paceya Sarayê û destê xwe jê re dihejînin.

Di çîroka bi navê *Beqên Kesî* de, hewl dide ku zilma ku zarokên gund li begên di nav golê de dikan,

rawestîne. Sara fêm dike ku ew nikare zarokan qanî bike û hemû beqan ji nav golê derdixîne û dibe mal, di bin cihê xwe vedişêre. Lê dema dibe sibe, beq li her derê belav dibin. Sara bi qêrîna dayîka xwe hişyar dibe û meseleyê jê re vedibêje. Sara alîkariyê ji diya xwe dixwaze. Ew û dayîka wê, beqan dibin berdidin nav goleke mezintir da ku zarok nekaribin xwe bigîhînin wan.

Di çîroka bi navê *Sara û Mîro* de, haya Sara pê çêdibe ku dayîka wê ducanî ye. Dayîka wê, bi agahiyêni ji pirtûkan, ji Sara re vedibêje ka bebik çawa têr dinê. Xwedê kurekî dide diya wî û navê Mîro lê dikan.

Di çîroka bi navê *Sara Alîkariyê Dike* de, Sara alîkariya pîra xwe dike û biajalan re diaxive û wan xwedî dike. Piştî ku ajalan têr dike, bi pîra xwe, xwarina ku pîrê çekiriye, dixwin.

Pirtûk ji bo zarokên ku temenê wan ji duyan mezintir e, hatiye nivîsandin. Pirtûkek e wisa ye ku mezin dê ji bo zarokên ku xwendinê nizanin, bixwînin. Pirtûk bi kaxiza biqalîte ya kûşeyê hatiye çapkirin. Qapaxa wê ji kartona hişk e û hatiye dirûn. Bi ebadêن xwe, mezinahiya pirtûkê li gorî bikaranîna zarokan e. Her çiqas resmîn pirtûkê dikare bala zarokan bikişîne ji, di resimandinê de

xeletiyêن cidî hene. Di hin resman de, boyax di nav hev de ne. Dayîka Sarayê, di her resmê de, wek jineke cuda hatiye xêzkirin. Her wiha, di paragrafê de qala şîr tê kirin, lê di resmê de vexwarineke din hatiye xêzkirin. Ger resimandin û sazûmana rûpelê bi awayekî baştir bê kirin dê qalîteya pirtûkê zêdetir bibe.

Di pirtûkê de, hezkirina ajalan di gelek cihan de hatiye vegotin. Dîsa, agahiyêن derbarê ajal û xwedêdana bebikan de, perwerdekar in. Ziman zelal e û tê famkirin. Lehenga çîrokê, Sara, karaktereke wisa ye ku zarok dé bikaribin xwe pê bikin yek.

ÎSMAÏL DÎNDAR – PALÛTE

Pirtûk, ji çardeh kurteçîrokan pêk tê û nivîskar ev pirtûk diyarî keça xwe kiriye. Di çîrokan de, em şopêن zaroktiya wî û erdnigariya ku nivîskar lê dijî, dibînin.

Di çîroka yekem a bi navê *Roşana Berfê* de, kêfxweşîya zarokên gund a ku piştî berf dibare, tê vegotin. Berfa ku kêfê dide zarokan, naçe xweşîya mezinan ji ber ku berf, ji bo mezinan, tengasiyêن pêşîya wan e.

Di çîroka duyem a bi navê *Batîrosok Xalê Îso* de, serpêhatiyêن çar zarokên gund ên ku diçin nav bîstana (bostana zebeşan) Xalê Îso, tê vegotin.

Zebeşen wî, zebeşen herî xweşik ên gund in. Lê Xalê Îso, bûye belayê serê zarokan û qet niyeta zarokan nîn e ku bikevin nav lepêن wî. Zarokên ku diçin nav bîstanê, bi ku de herin Xalê Îso li wir dibînin. Fêm nakin ka ev yek çawa çêdibe û dev ji xwe veşartinê berdidin. Dibînin ku li gelek cihêن bîstanê, batîrosokên ku Xalê Îso cilêن xwe lê kirine, hene. Piştî ku viya hîn dîbin, bi dilê xwe têr zebeşan dixwin.

Di çîroka sêyem a bi navê *Cihana Ajalan* de, meraqa zarokekî ya derbarê ajalan de tê vegotin. Ev zarok havînan diçe gund û di wan deman de bi awayekî nêzîk ajalan raçav dike. Demia dibistan vedîbin, ew diçe bajêr û hin caran ji mamosteyê xwe dipirse, hin caran ji lêkolînan dike derbarê ajalan de û zêdetir agahîyan hîn dibe. Zarok biryare dide ku di pêşerojê de bibe veterîner.

Di çîroka bi navê *Du Av Yek Spî Yek Reş* de, çîroka zarokekî ya dema bi malbata xwe re diçe Mêrdînê, vedibêje. Zarok cihê ku aveke spî û aveke reş tevî hev dîbin, pir meraq dike. Ev her du av, piştî navbereke dirêj digîhin hev lê bi temamî tevîhev nabin. Cihê ku lê tevîhev dîbin bi coştit û rengeke cudatir diherikin. Di çîrokê de, zêdetir qala dewlemendiya erdnigariya Mezopotamyayê tê kirin.

Di çîroka pêncemîn a bi navê "Kî éaqil e?" de, ji devê zarokekê, çîroka kuçikekê bi navê Siwar ê ku hemû malbat jê hez dike, tê vegotin. Ev kuçik, di gelek karan de, gelek caran alîkariya malbatê dike û dema dimire, wekî ku endamekî/endamekê malbatê miribe, malbat pir xemgîn dibe. Ji bo hînkirina hezkirina ajalan û hevaltiya wan a bi mirovan re, çîrokeke xwesik e.

Di çîroka *Gundê Roşanan* de, qala zarokekî ku bi Suryaniyan re li heman gundî jiyaye û cejnîn gund vedibêje, tê kirin. Di heman gundî de, zarok di cejnîn çandên cûda de çî dikan, tê vegotin. Piştî salan, ev zarok vedigere gundê xwe lê dibîne ku tenê du malên Suryaniyan mane û rojén berî tê bîra wî û xemgîn dibe. Coşa cejnan, bi kesên ku ji gund çûne, winda bûye.

Di çîroka heftemîn a bi navê Palûte de, bavê zarokekî dikeve zindanê û ji ber ku kesek namîne karê wan ê gund bike, gundî bi awayekî hevbeş alîkariya malbata vî zarokî dikan. Navê vê çîrokê, di heman demê de, navê pirtûkê ye ji. Rojekê, çend jin û mîrên çekdar têna mala wan. Ev kes bi vî re eleqedar bûne û jê hez kirine. Piştî ku ev çûne, leşker hatine mala wan, mala

wan belavela kirine û bavê vî biriñe. Piştî vê, rojên reş bûne qedera malbatê. Dapîr û bapîrê zarokî kal in û dayîk jî ducanî ye. Ji ber ku ew jî hê biçûk e, tu kes nebûye ku karê zeviyê bike. Lê gundî alîkariya wan dikin. Çîrok, ji ber ku rastiya herêmê vedibêje, ji rastiya zarokan jî nebûye. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku çîrok fîkrêni îdeolojîk venabêjê, çîrokeke rast e. Her wiha, qala alîkariyê dike, ji ber vê sedemê, perwerdekar e.

Di çîroka bi navê *Geûré* de, zarokek bi malbata xwe di betlaneya havînê de diçe gund û li wê derê, çêlikeke hirçan xwedî dike. Piştî ku vedigerin bajêr ew û çêlik ji hev vediqetin û çîrok bi gelempêri li ser vê mijarê ye. Çîrok di warê vegotina têkiliya hezkirinê ya navbera mirov ajalan de û nîşandana rûyê zalimane yê bexçeyên heywanan de, serkeftî ye.

Di çîroka nehemîm a bi navê *Rovî û Xalê Evdî* de, baxên tiriyan ên Xalê Evdî hene û dixwaze wan ji rovî rizgar bike. Ji bo vê jî dafekê amade dike û rovî digire. Lê dema rovî hewl dide ku dafê veke, milê Xalê Evdî gez dike û her du bi vî halî dimînin. Di tevahiya pirtûkê de, hem aliyên baş ên ajalan tê vegotin û hem jî aliyên wan ên nebaş. Di vî

warî de, çîrok rastiyekê vedibêje. Bi vê çîrokê, aliyên ajalan ên xetere ji tên diyarkirin.

Di çîroka *Taşteya Bavê Min* de, qala zarokekî tê kirin ku bavê wî li zeviyeke dûrî mala wan dixebite. Dayîka wî, her roj xwarinê dide zarok da ku ji bavê wî re bibe. Di zeviyê de, bavê wî bi tenê dixebite lê dayîka wî her roj bi qasî têra çar pênc kesan bike, xwarinê dişîne wê derê. Zarok vê yekê fêm nake. Lê piştre hîn dibe ku bavê wî xwarina xwe bi kesên ku di zeviya ku bavê wî lê dixebite re derbas dixin, xwarina xwe bi wan re parve dike. Di vê çîrokê de, zarok hînê vê rewşa ku di çanda me de belav bûye, lê iro zêde nayê dîtin, dixin.

Di çîroka yazdemîn a bi navê *Destger* de, zarokek heşt salî, bi ereboka destan, li bazarê barê kesên ku danûstendinê dikan, dîkişîne. Bavê vî zarokî hatiye kuştin û gundê wan hatiye şewitandin. Li bajêr bi dayîka xwe ve zor zehmet debara xwe dikan. Dayîka wî ji paqijiya malan dike. Xeyala zarok ev e ku pir bixebite û di pêşerojê de bi dayîka xwe re, rehet rehet bijî. Li welatê me, pirsgirêka karkerên zarokan heye û ji bo diyarkirina vê ji çîrokeke girîng e.

Di çîroka bi navê Hechecik de ji, hezkirina zarokekî ya bo

hechecîkekê tê vegotin. Zarok meraq dike ka hechecîkên bahara borî hatibûn mala wan, dê vê biharê ji werin an na. Ev libendêmayîna wî, carinan bi tîrsa îhtîmala ku ajalên din dê hechecîkan girtibin û xwari-bin, hêviyên wî dişkîne.

Çîroka sêzdemîn, metneke wisâye ku tê de çîrokek derbas dibe. Xalê Gernas, di çîroka xwe de çîroka Zerdeş û zarokên wî vedibêje. Dema Zerdeş kal dibe û dizane ku wê bimire, zarokên xwe kom dike û ji wan re wasiyeta xwe ya dawî dibêje: bila li her gundekî maleke we hebe. Li ser vê yekê, zarok li her gundekî malekê ava dikan. Li gundekî, hevalekî bavê wan li rastî wan tê û wan dibe mala xwe. Ew kes ji zarokan re dibêje ku dema bavê we digot li her gundekî bila maleke we hebe, wî digot ku bila li her gundekî hevalên we hebin da ku hûn bikaribin li mala wan bimînin. Piştre zarok wasiyeta bavê xwe fêm dikan. Ev çîrok qala girîngiya têkiliyê hevaltiyê dike.

Di çîroka dawî de, serpêhatiyê zarokên ku bi meraqdarî dixwestin biçin seyrana behrê tê vegotin. Seyrana ku bi awayekî xweş destpêkiriye, piştî bahozekê vedigere rewşek xirab.

Ev pirtûk, di nav rîza yekemîn a pirtûkxaneya ciwanan de cih digi-

re. Guncaw e ku kesên temenê wan ji dehê zêdetir e vê pirtûkê bixwînin. Ji ber ku mezinahiya puntovan û kêmbouna resman jî vê pêşniyârê pişterast dike. Zimanê pirtûkê zelal e û tê fêmkirin lê belê gelek xeletiyêñ nivîsê û çapê hene. Pirtûk, ji aliyê taybetiyêñ derveyî ve, ne ev qasî xirab e.

Çirokên di pirtûkê de, zêdetir jiyana gundan, têkiliyêñ mirovan û ajalan, hezkirina ajalan, hevalti û alîkarî wek mijar girtine. Ji bo zarokên ji deh salî mezintir, pirtûkeke perwerdekar e.

YAQOB TILERMENÎ – KERMÊŞA GEROK

Lehenga pirtûkê kermêsek e. Hevaltiya wê ya bi qîza piçûk a malbatê, bi Rozayê re, tê vegotin. Dayîka Rozayê, Zana, jineke xebatkar e û di heman demê de ji bo zarakan pirtûkan dinivîse. Piştî ku kermêş li Zanayê vedide, hin taybetiyêñ insanî li kermêşê peyda dîbin. Dikare wek Zanayê bifikire, pirtûkan bixwîne û biaxive.

Kermêşa ku bi Rozaya pênc salî re bûye heval, pê re li ser pirtûkan diaxive û hin agahiyêñ îdelojîk dideyê. Bavê wê ferq dike ku keça wî di rojêñ dawî de, axaftinêñ wê, ne wekî axaftinêñ kesekê vî temenê de ye û ji bo vê jî ba-

wer dike ku kermêşê li Rozayê vedaye û ji ber vê yekê jî ew xeyalan dibîne. Dixwaze kermêşê tune bike. Kermêş, aşiqê kermêşekî ku tê mala Rozayê, dibe û bi hev re ji malê vediqetin û li dargerîngêñ bi dîwaran ve, danin. Zana ji ber tiştêñ ku wî di rojêñ dawî de dîtine, çirokeke utopîk a kermêşan nivîsiye û dema li kermêşen ku danîne li ser dîwaran dinêre, tiştêñ ku jiyaye difikire.

Pirtûk hem di warê naverokê û hem jî di warê şêweyê de, ne li gorî xwendevanê zarok e. Ji aliyê naverokê ve, ne li gorî zarokên temenmezin an jî ciwanan e ji. Ne rast e ku jiyana Rosa Luxemburgê bi gotineke ideolojîk, ji Rozaya pênc salî re tê gotin. Her wiha, fabla ku ji Kelîle û Dîmne hatiye stendin ku hêmanen şidetê û hestêñ tolhildanê dihewîne, dibe ku wan hestan hînî zarokan jî bike.

Kermêşa mî hê bi kermêşeye nêr neketiye têkiliyeke zayendî. Vê yekê, bi pirtûkên ku jinan diparêzin ve girê dide. Ev têgihiştin dibe ku bibe sedema tiştekî wisa: heke kesek wan pirtûkan bixwîne, ew ê jî nekaribe bi kesekî/kesekî din re têkiliyeke zayendî li dar bixe. Pirtûk bi vî awayî bê xwendin, dê ji fêdeyî zêdetir, zererê bide xwendevanan.

BÊRÎ BIHAR – ŞEMAR Û SOLÊN RENGÎN

Lehengê çîrokê, bejmarekî bi navê Şemar e. Ji ber ku di germa havînê de piyên wî dişewitin, Şemar nikare derkeve derve û xwarinê peyda bike. Hevalê wî, Sîsirk, jê re dibêje ku heke ew biçe bi moriyan re bixebite, ji bo solan dê bikaribe pere kom bike. Şemar bi moriyan dixebite û pere kom dike. Pere dide kuliye solbend da ku jê re solan çêke.

Şemar bi saya pêşniyara Sîsirkî ji xwe re sol stendine û bi pereyên mayî jî tiştên xwarinê kirîne û biriye mala Sîsirkî. Lê zehmetiya mezin ew e ku heta bejmar cil kit sol ji piyên xwe kirine demeke dirêj derbas bûye. Dema dikeve malê, bi Sîsirkî re kêf dikan. Ji ber ku li mala xwe ne hewce ye solên xwe ji xwe bike, Şemar pir dilşa dibe.

Ebadêن pirtûkê biçûk in û pirtûk bi şazdeh rûpel e. Ji bo xwendekarêن heta heşt saliyan guncaw e. Di warê cild û qelîteya rûpelan de, ne xirab e. Her çiqas resmên di pirtûkê de, li gorî nivîsê bibin jî, ne gelekî baş in. Bi taybetî jî lehengê çîrokê Şemar, qet ne wekî kesekî xwîşîrîn hatiye resimandin. Di sererastkirina resm û nivîsan de jî hin şaşîti hene.

Zimanê pirtûkê zelal e û zarok dikarin fêm bikin. Di pirtûkê de, di şexsê Şemar de, her çiqas

pêdiwî û temîkirina wan wekî hewcedariyekê hatibe nişandan jî, li vir rastîtiya mirovan tê hîskirin.

Encam û Nîqâş

Kêmasiya herî herbiçav a pirtûkan ew e ku resimandin û taybetiyên şeweyî têrî krîteren pirtûkêن zarakan nakin. Faktorén herî gitîng ên ku bala zaro-kan ji bo xwendinê dikişînin ev in: qapax, resm, şekl û hwd.

Qapaxêن ku ne hişk in an jî yên ku bi zeliqandinê an jî zimbeyan hatine çekirin, saxlembûna pirtûkêن cildkirî kêmîtir dike. Ji nav pirtûkan, tenê pirtûka bi navê Sara bi qapaxa muqawe ye û hatiye dirûn. Mezînahiya pirtûkêن ku hatine lêkolîn, ne wekî hev in. Zarok ji xwendina pirtûkêن bi ebadêن cuda cuda, hez dikan (Mennanoğulları, 2008).

Pirtûkêن ku hatine lêkolîn, hemû biresm in lê ji wan di sê heban de resmîn rengîn hene û yên din bêreng in. Di resman de xeletiyên teknikî hene. Ji ber ku têkiliya nivîs û resman nîn e, pirtûk taybetiya xwe ya perwerdekariyê jî winda dike. Güneş (2000) di xebata xwe de diyar dike ku di hin pirtûkan de têkiliyek di navbera resm û nivîsan de nîn e.

Tenê di pirtûkêن Kermêşa Gerok û Palûteyê de, derbarê nivîskaran de

agahî hatiye dayîn. Di çar pirtûkên din de agahiyek nîn e. Taşdemir (2005) di lêkolînekê de diyar dike ku di gelek pirtûkan de agahiyêñ derbarê nivîskaran û berhemêñ wan de nayêñ dayîn. Ji xeynî pirtûka bi navê Sara, di tu pirtûkan de nehatiye gotin ka ew pirtûk li gorî kîjan temenê ne.

Di pirtûkan de xeletiyêñ çapê û rezimanî hene. Bi gelempêri, zimanê pirtûkan zelal e û tê fêmkirin. Civaroglu (2000) tîne ziman ku xeletiyêñ bi vî rengî yêñ di pirtûkên zarokan de, rê li ber hînkirina awayekî xelet vedike ji ber vê yekê divê xebateke titîz bê meşandin.

Pirtûkên zarokan, peyamên perwedehiyê dihevînin. Pirtûkên ku di vê xebatê de hatine lêkolîn, agahiyêñ hînkerî didin zarokan. Temayêñ wek alîkarî, hezkirina ajalan, hevaltî hatine hilbijartin. Her çiqas naveroka hin pirtûkan fêde bide zarokan jî, hin pirtûk îdeolojiyan li zarokan bar dike, ne perwerdekár in û ne jî li gorî zarokan in. Dilidüzungün (2012) jî diyar dike ku hinek pirtûk ne perwerdekár in û hin nîrxêñ diyarkirî li zarokan bar dikin ji ber vê yekê divê mamoste, pedagog û dêûbav bi awayekî hişyarî pirtûkan hilbijêrin bikin.

Di pirtûkan de, derdor bi gelempêri li gund e, lê hin çîrok li bajaran jî derbas dibin. Çîrokêñ ku jiyan, listik û kîrinêñ zarokêñ li gundan dijîn vedibêje, çanda Kurdistanê derdixe pêş. Oğuzkan (2006) destnîşan dike ku divê di pirtûkan de nîrxêñ çandî hebin û ew jî rastiya civakê dûr nebin.

Lehengêñ di pirtûkên zarokan de, xwedî girîngiyeke mezin in. Piraniya wan wisa ne ku zarok xwe bi wan re dikin yek. Lî di heman demê de, hin leheng hene ku divê zarok ji xwe re wekî mînak nebînin. Lehengêñ sereke, ji xeynî taybetiyêñ wan ên neyînî, biaqil û wêrek in û jî alîkariyê hez dikin. Gönen, Katrancı, Uygun, Uçuş (2011) jî li ser vê yekê heman encam bi dest xistine.

Pêşniyar

Heke em astengiyêñ li ber perwerdehiya bi zimanê kurdî bidin ber çavan, qîmeta perwerdekariya pirtûkên zarokan ên bi kurdî derdikeve holê. Pirtûkên bi qelîte, dikare li ba zarokêñ kurdan de eşqa xwendin, nivîsandin û zimanê dayîkê derxîne meydanê. Li gorî Severê (2013) pirtûkên zarokan ên baş hatine amadekirin, dikarin di zarokan de, hezkirina zimanê dayîkê pêk bînin. Li gorî encamê

vê xebatê ku pirtûkên zarokan ên bi kurdî hatine nivîsandin lêkolîn kiriye, pêşniyarêng girîng li jêr hatine rêzkirin:

Di hînbûna zimanê zîkmakî de, rastnivîsa di pirtûkan de girîng e, ji ber vê yekê divê piştî ku hemû nivîs û xeletî têr sererastkirin, pirtûk bêncapkirin.

Ji bo hînbûna zimanê dayîkê, di rûpelên dawî yên pirtûkê de divê ferhengêk bê bicikirin.

Nivîskarêng pirtûkêng zarokan, divê li gorî rîgeza "li gorî zarokan" tev bigerin û tu îdeolojiyan li zarokan bar nekin. Tayetiya hînkirinê ya pirtûkan jî zêdetir divê li ser qabiliyeta zarokan a 'jêderxistinê' bêng amadekirin.

Weşanxaneyêng ku pirtûkêng zarokan amade dikin, divê teqez bişewirin kesen di vî warî de pispor in û piştre pirtûkan çap bikin. Divê di her weşanxaneyê de, kesekî/keskêkê ku li ser pedagojiyê perwerde dîtiye, editoriya pirtûkêng zarokan bike.

Divê di çîrokan de lehengêng ku zarokêng iro dê bikaribin xwe bi wan re bikin yek, bêng vegotin.

Ji ber ku qapaxa jî muqeweyê maliyetê bihatir dike, qet nebe qapaxêng qartonêng qalind ên bi plastîkê têr pêçan, bêng bikaranîn dê saxlemtiya pirtûkan zêdetir bike.

Eger sêwira pirtûkê bi awayekî şareza bê amadekirin, dê bala zarokan bikişîne. Cildêng ku bi zeliqandin an jî zimbeyan têr çekirin ne li gorî zarokêng temenbiçûk in. Ji bo zarokêng temenbiçûk, divê pirtûk bêng dirûn.

Di pirtûkan de divê derbarê nivîskar û berhemêng wî/wê de agahî bê dayîn. Pirtûkêng bi heman armancê hatine amadekirin, dikarin di rûpela piştê de bêng nasandin. Agahiyêng bi vî awayî dê zarokan agahdar bike û wan sewqî kirîna pirtûkêng din bike.

Pirtûk ji bo kîjan temenê hatibin amadekirin, divê li ser qapaxêng pirtûkan bêng nivîsandin. Ev yek, di hilbijartina pirtûkan de, dê alîkariya hem dê û bavan hem jî ya zarokan bike.

Di pirtûkêng zarokan de, kaxiza herî guncaw, kaxiza kalk e ku radeya seluloza wê zêde ye. Kaxizêng kuşe, di cihêng bi ronahî de diteyisin û xwendîna nivîsêng ser wan zehmet e. Kaxizêng spî, çavê xwendevanan diwestîne. Kaxizêng kalk ên ku ne bi qelîte ne, zû dicirin.

Resmêng di pirtûkêng zarokan de, divê bi naverokê ve girêdayî û ji aliyê teknikê ve bêkemâsi bin. Heke resimandînê kesen pispor bikin, vê demê dê qelîteya pirtûkan zêdetir be.

Çavkanî

- Akşehirli, S.(2011). *Di Konteksta "Hestiyariya Zaroki" de Çiroka Mirina Bêxemekî ya Reşat*. Xebatên Tirkî (Weşanên Periyodik ên Navnetewî yên ji bo Ziman, Wêje û Dîroka Tirkî), 6/3, 439-446.
- Civaroglu, Ö. (2000). *Wêjeya Zarakan* (4. Baskı). Stenbol: Weşanxaneya Esin.
- Çılgin, A.S.(2007).** *Wêjeya Zarakanı*. Stenbol: Weşanên Çanda Morpa.
- Dildizgün, S.(2012). *Wêjeya Zarakan a Hemdem (Çapa 3'yem)*. Stenbol: Weşnaên Çanda Morpa.
- Gönen, M., Katrancı, M., Uygun, M., Uçuş, Ş.(2011). *Lêkolîna li ser Naverok, Resimandin û Taybetiyen Fiziki yên Pirtükên Zarokên di Asta Yekem a Dibistana Pêşin*. Perwerde û Zanist 36, 250-265.
- Güler, M. (1992). *Wêjeya Zarakan Wêjeya Pola Çendemin E?* Nivisên Wêjeya Littera: Weşanên Karşı, 3, 125-128.
- Gülcü, H.(2003). *Wêjeya Zarokên Afiriner (Çapa 2'yem)*. Enqere: Weşanên Pegem A.
- Güneş, F. (2000). *Lêkolîna Pirtükên Zarokan a li ser Pivanê Xwendinê. Sempozyuma Yekem a Netewî ya Pirtükên Zarokan, Zanîngeha Engereyê*, Enqere.
- Gürel, Z.(1992). *Ceribandinek li ser 'Ji Salâ Zarokan a Cîhanê Heta Îro Wêjeya Zarokan'*. Nivisên Wêjeyî yên Littera: Weşanên Karşı, 3, 136-156.
- Mennanoğulları, B. (2008). "Nêrinén Tekildarı Taybetiyen Tipografik ên Pirtükên Çirokan ên Zarokên di Asta Yekem a Dibistana Pêşin de." "Teza lisansa bilind a nehatiye wêsandin, Enstituya Zanistê Perwerdehiyê ya Zanîngeha Gaziyê, Enqere.
- Oğuzkan, A. F.(2006). *Wêjeya Zarokan (Çapa 8'emîn)*. Enqere: Weşanên Anı.
- Özmen, Ş. (2010).** *Uçurmanın Ardından Bildiri. Heppeyiñek bi Miran Janbar re li ser Wêjeya Zarokani*. Sicak Nal, 2, 64-70.
- Pertew, R. (2011). *Zarok û Edebiyata Bi Zimanê Zîkmakî*. Nûbihar (Dosye/ Rewşa Edebiyata Zarokan), 116, 54-59.
- Sever, S.(2008). *Zarok û Wêje..* Enqere: Tudem.
- Sever, S.(2013). *Wêjeya Zarokan û Çanda Xwendinê*. Enqere: Tudem.
- Şimşek, T.(Ed.) (2012).** *Pirtûka Destan a Ji Teoriyê ber bi Sepandinê Wêjeya Zarokan*. Enqere: Weşanên Grafiker.
- Şimşek, T., Arslan, M. A. , Y. M. , Yakar. (2012). *Pirtûka Destan a Ji Teoriyê ber bi Sepandinê Wêjeya Zarokan*. Enqere: Weşanên Grafiker.
- Tacettin Şimşek(Ed.), *Dîroka Wêjeya Zarokan* (t. 45-80). Enqere: Weşanên Grafiker.
- Tan, S. (2012). *Bihareke Rikoyî. Vecdi Erbay(Ed.), Têkoşîna Azadiyê a Gelê Kurd û Zimanê Kurdi*. (r. 121-129). Stenbol: Ayrıntı.
- Taşdemir, M.(2005). *Wek Materyaleke Perwerdehiyê, Asta Qelitêyê ya Çirok û Romanên Zarokan*. Kovara Milli Eğitim, 33(168), 7-29.
- Uzun, M.(2007). *Destpêka Wêjeya Kurdi*. Stenbol: İthaki.
- Yalçın, A. ve Aytaş, G.(2008). *Wêjeya Zarokan (Çapa 4'emîn)*. Enqere: Weşanên Akçağ.
- Yıldırım, K. (2008). *Kulliyata Ehmedê Xaniya Yekem:Nûbehara Biçûkan Ferhenga Erebi-Kurdi, Kurdi-Erebi*. Stenbol: Avesta.
- Zinar, Z. A.(2011). *Di Çanda Kurdi de Zimanekî Zarokan ê Taybet Heye Ku Fw Pê Dipeyivin*. Nûbihar (Dosye/ Rewşa Edebiyata Zarokan), 116, 60-64.

TAVKIRLILAR TARİHİ VE KÜLTÜRÜ

Modern dünyanın her yerinde araştırma ve inceleme çalışmalarının temel kaynağı yazılı kaynak ve belgelerdir. Yazılı kaynak ve belgeler olmayınca araştırmacıların temel başvuru kaynağı geçmişe ilişkin anılar, gözlemler, hatırlar ve yaşayan kişilerin anlatımlarıdır. Objektif bir araştırma yapmak için seçenekler sınırlı olsa da inceleme süreci uzun ve yorucu olabilir. Çalışma yöntemi sözlü referansları temel aldığı için incelemenin güvenirliği gölgelenir. Sözlü kaynaklar bilimsel bir incelemede ele alınınca referans olarak yetersiz ve çelişkili bilgiler içerir. Çünkü kişiler hikayelerine kişisel yorum ve görüşlerini katar dolayısıyla inceleme için edindiğimiz bu bilgi verisi objektif değildir. Anlatıkları hikaye her ne kadar olayla ilgiliyse de yapılan bilimsel çalışmanın değerini düşürür, araştırmacıların işini zorlaştırır, çalışma süresini uzatır ve alanını genişletir. Elinizdeki kitap bu konuda somut ve çarpıcı bir örnektir.

Yazarlarımız Hüseyin Mirza Karagöz ve Ali Karagöz Tavkirar köylülerinin kökenini, göç serüvenlerini, dil ve kültürlerini araştırmak, incelemek istemişler. Tavkirarlara ilgili bugüne kadar yazılı kaynak ve belgelerin olmayaşından dolayı sözlü kaynaklar bu çalışmanın temel referansı olmuş. Tavkirarlular Elazığ'dan, Maraş, Malatya, Kayseri, Sivas, Mersin, Suriye, İuveç ve Avrupa'nın diğer ülkelerine kadar geniş bir coğrafyaya dağıldığından her iki yazarımız, beş yıl gibi uzun bir zaman diliminde adı geçen şehir ve ülkelere seyahet ederek oradaki Tavkirarlara olabildiğince tarafsız ve bilimsel bir yöntemle araştırma, inceleme ve söyleşilerini gerçekleştirmiştir.

Hem zaman hem maddi yönden fedekarlık ve emek isteyen bu zor ve yorucu çalışma Tavkirarlara üzerine yapılan bir ilk çalışmadır.

Navnjanen xwestiné/İsteme adresleri:

Hüseyin Mirza Karagöz

hmkaragoz@hotmail.com

Telefon: +46 (0)73 728 51 21

Ali Karagöz

ali.cawras@hotmail.com

Telefon: +46 (0)70 450 20 50

TAVKIRLILAR TARİHİ VE KÜLTÜRÜ

Araştırma - İnceleme



Hüseyin Mirza Karagöz

Ali Karagöz



Bu çalışma ile birkez daha görüleceği gibi Kürt halkı aslında yazılı bir tarihi geleneğe sahip olmayışının bedelini ağır bir şekilde ödüyor. Yapılan en küçük çalışmalar dahi tarihimize yazılı kaynaklarla sahip çekmamızın önemini bir kez daha ortaya koyuyor.

Tavkirarlara tarih ve kültürünü sunan bu inceleme, kökenini arayıp bulmanın dışında sosyo-kültürel bir araştırma olarak kendi alanında bu güne kadar yapılmış çalışmalar arasında önemli bir yer tutacak niteliktidir. İnsan ve yer isimleri, tarım ve hayvancılık alanında kullanılan söz, kavram ve deyimler Tavkirarlara özgü Kürtçe şivede yer almıştır. Dini inanışlar, töreler, evlenme ve düğün gibi gelenek ve göreneklerin anlatıldığı bu kitap da tarihi değeri olan bölgelerin doğa resimlerine de genişçe yer verilmektedir.

Tavkirar Sosyal Dayanışma ve

Kalkınma Derneği

(TAVDER)

Betgatan 62

SE-754 49 Uppsala

www.adlibris.com

Apec-Tryck & Förlag AB


Mjölnarstigen 1

SE-163 41 Spånga/Stockholm

Telefon: +46 (0)8 761 81 18

info@apectryck.se

www.apcnu.se



Kitêba Nuh Ateş a bi navê NIVİSEN PERİ

bi naveroka serpêhatî, bîranîn, serhevde û şîroveyên bi zaravayê xelika, nêzik da ji nav weşanên APECê de derdikeve

Ji niha de hûn dikarin sparişên xwe li ser edresa li jêr bidin.

Çend rêz ji pêşgotina niviskar;

... "Sewa ku ew wenda nebin, baştir bêñ xwandin û belavkirin min xwest wan wekî kîteb bidim weşandin. Ku we xwand hunê bibînin, mijara nivîsan curbicur e û pirtir li ser ziman, jiyan û kultura gundê Xelika ye. Meriv dikana piranîya wan wekî nivîsen antropologîk yên li ser gundekî kurmanc li Anatolîyayê jî binav bike. Birek ji nivîsan taybetmendiyeke xwe heye. Ew ê li gorê kevnehunera kurmanca ya katkirinê (vegotinê) hatine nivîsandin. Li gorê vê kevnehunerê, meriv berî ku destpê qalkirina mijarê bike, hekayetekê kat dike. Yanê di nav hînek meqeleyan da para hekayetan jî heye. Eger meriv bixwaze nivîsan li gor besên edebî parva bike, hingê birek ji wan dibe serpêhatî, bîranî, pêkêni, şîrove... Mijara henan jî rabûn û rûniştinên civakî û sîyasiye. Mijarek jî kurmancîya ku li Xelika tê dengkirin, taybetî, peyv û bêjeyên wê yên cûda ye."

Apec-Tryck & Förlag AB

Mjölnarstigen 1

SE-163 41 Spånga/Stockholm-

Telefon: +46 (0)8 761 81 18

info@apectryck.se

www.apec.nu/forlag